
# JI WEZARETÊ DEREWA MEZIN

**Parêzerê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, Cengîz Çîçek got ku wêneyên Wezareta Dadê dane raya giştî û tiştê muwekîlê wan ji wan re gotiye qet naşibe hev**

Parêzerê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, Cengîz Çîçek wêneyên ku Wezareta Dadê bi armanca xweşnîşandana şert û mercên girtîgeha Îmraliyê li çapemeniyê belav kirin ji bo me nirxandin. Çîçek, destnîşan kir ku li gorî agahiyên ku muwekîlê wan ji wan re gotiye pencereya ku bi deriyê vedibe hewşa berhewayê di hucreya wî de nîn e û pencereya hucreya ku muwekîlê me tê de tê hiştin ji 3'yî 1'î vê pencereyê ye û li jora derî ye.

Parêzer Çîçek ji bo wêneyên ji aliyê Wezareta Dadê ji raya giştî re hatiye pêşkêşkirin wiha got: "Di wêneyekî de maseya tenîsê dixuyê. Lê muwekîlê me ev 11 sal in li Îmraliyê tê girtin û rojekê bi tenê jî ji vê salonê îstîfade nekiriye. Her wiha odeya hobiyê dixuyê. Ji bo vê odê jî heman tişt pêkan e. Li gorî Qanûna 5275 xala 25 benda H hatiye destnîşankirin ku jê îstîfadekirina ji van derfetan li gorî rêziknameya navxweyî ya saziyê pêkan e... RÛPEL - 4



Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di hevdîtina xwe ya borî de gotibû pencereya hucreya ku ew tê de tê hiştin ji 3'yî 1'î vê pencereyê ye û li jora derî ye.

ROJEV

5 Kanûn - Şemî 2009 E-mail: awelat2002@yahoo.com Buha: 50 Ykr Hejmar: 23

# Kurd tasfiyê qebûl nakin

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan destnîşan kir ku bi planên tasfiyeyê pêvajo nayê berdewamkirin û li hemberî vê tasfiyeyê gelê kurd dê li ber xwe bide û îradeya xwe teslîmî kesekî nake



### 'KURD RÛMETA XWE RADESTÎ KESEKÎ NAKIN'

Ocalan di hevdîtina xwe ya bi parêzeran re got ku dixwazin kurdan fêrî tasfiyeyekê bikin, lê kurd vê yekê qebûl nakin. Piştî vê qonaxê kurd hebûn û rûmeta xwe radestî kesî nakin. Ez bibêjim jî radest nakin. Ji niha û pê ve dê ji bo hebûn û rûmeta xwe bijîn." Ocalan, hikûmeta AKP'ê ya hesabê tesfiyeyê dike û CHP û MHP'ê ku di siyaseta bêçaresiyê de bûne hevpar, rexne kirin.

### 20 ROJ CEZAYÊ HUCREYÊ DAN OCALAN

Rewşa tenduristiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan gelekî xirab e, bi ser de jî cezayê hucreyê yê 20 rojan lê hat birîn. Ocalan, got ku hinceta vî cezayî ji hevokeke di axaftineke wî de ye û wiha got: "Vî cezayî dispêrin axaftineke min. Tevahiya axaftinê negirtine. Ez tesbîtekê dikim, ew ji nava vê tesbîtê bi tenê hevokekê digirin dest û dibêjin te talîmat daye."... RÛPEL - 8

Saziyên mafên mirovan komîsyona lêkolînê xwest... 5

Hikûmeta AKP'î bi adirî kay keno... R.2

Ji girtiyên PKK'î hişyarî... R.4

## 'Ji hesasiyetên gel re rêzdar bin'

98 Şaredarên DTP'ê û Serokên Meclîsa Giştî ya Bajar ên 10 bajaran ên DTP'î têkildarî şert û mercên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li ber DTP'a Amedê daxuyanî da çapemeniyê. Li ser navê Şaredarên DTP'ê û Serokên Meclîsa Bajêr a Giştî, Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê Osman Baydemîr got ku hikûmet û derdorên din divê li hemberî hesasiyetên gelê kurd rêzdar bin. Baydemîr, diyar kir di dema hikûmeta AKP'ê de polîtîkayên Îmraliyê bûne tîrê zêrandinê... RÛPEL - 5




## Bê Ocalan çareserî nabe

Têkildarê mercên Îmraliyê û rewşa Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, Nûnerê Komeleya Bedirxan Hemîd Ebubekir diyar kir ku çareserî bê PKK û Ocalan pêk nayê û wiha got: "Gelê kurd jî wekî gelên din dixwaze azad bijî. Li bakurê Kurdistanê nêzîkî 25 milyon kurd hene. Hikûmeta Tirkiyeyê naxwaze vê yekê bibîne. Li hemberî vê yekê dixwaze PKK'ê tune bike. Êdî xebata kurdan berdewam e, dîplomasiya wan baş bûye... RÛPEL - 5



## Ji saziyan hişyarî

Nûnerên saziyên civakî yên li Êlihê bal kişandin ser rewşa Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û daxuyandin ku ji ber ku Ocalan hesasiyeta gelê kurd a herî bilind e, divê di zûtirîn demê de CPT, DMME û dewleta tirk berpirsyariya xwe bi cih bîne û îşkenceya li Îmraliyê bi dawî bike. Serokê Şaxa DTP'ê ya Êlihê Denîz Topkan diyar kir ku nêzîkatiya hikûmetê talûke ye, hesasiyeta gelê kurd a ji bo Ocalan tê zanîn û lazim e dewlet di vê mijarê de samîmîtir be. Serokê Şaxa Genel-Îş'ê ya Êlihê Halîs Yakut jî got ku mafê jiyanê yê Ocalan tê binpêkirin. Ev d i nav gel de bûye sedema înfîalê. Birêz Ocalan ji bo gel noqteyeke hesas e... RÛPEL - 5

## Serê kesekî 3 leşker dikevin

Navçeya Çelê ya Colemêrgê di warê leşkerî de wekî ku hatiye dagirkirin. Li navçeya ku nifûsa wê 7 hezar û 500 e, ji 22 hezaran zêdetir leşker û polîs hene. Bi îfadeyeke din ji kesekî 3 leşker dikevin... RÛPEL - 3

## 'Wateya mayina li meclisê namîne'



DTP'ê li hemberî îhtimala girtina DTP'ê biryara terkkirina meclisê da û diyar kir ku ger ku DTP bê girtin pirsgirêkên heyî dê kûrtir bibin û ew ê meclisê terk bikin û vegerin nava gel. Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk diyar kir ku dema ku partiya wan bê girtin tu wateya wan ya li meclîsê namîne û dê ji siyasetê xwe paşve bikişînin. Hevseroka DTP'ê Emîne Ayna jî têkildarî girtinê got: "ew tê wateya ku ji me re dibêjin di nava siyaseta demokratîk de cihê we tuneye." Aynayê, destnîşan kir ku heke partiya wan bê girtin tê wateya hemû kanalên siyaseta demokratîk digirin û wiha got: "Dewlet bi destnedanê an jî girtina partiyê kanalên siyasetê bigire, em ê di çi de israr bikin."DTP têkildarî doza der heqê girtina partiya wan de û doza Dadgeha Makezagonê ya dê di 8'ê kanûnê de bê dîtin bi awayekî awarte kom bû.

www.arsivakurdi.org

# Kurmê şîrî heta pîrî...

## Piştî Komploya Navneteweyî li başûrê Kurdistanê pêvajoya guncandina sermayedariyê dest pê kiriye Patronên sermayê gelo niha şerê birakujiyê yê nerm dimeşînin?

OZAN ERDEM

Li başûrê Kurdistanê çi diqewime? Patronên sermayeyê gelo şerê birakujiyê yê nerm dimeşînin? Belê ev heft-heşt sal e qaşo şer di nava kurdan de nayê kirin. Vê yekê ji bo ku kurd piçekî pêşiya xwe bibînin, derfeteke mezin afirandiye. Lê belê pêşîdîtin li derekî, hêzeke weke artêşa Tirkiyeyê yekem car ji ber piştnegirtina hêzên Başûr, derbeyeke mezin xwar û operasyona 25'emîn bû şikestek mezin ku berpirsiyariya wê tu kes newêre bigre ser xwe. Van heşt salan gelek derfet afirandin lê ji vê merhalê û pê ve nebûna konferans an jî kongreyeke neteweyî (mebesta me destpêka pêvajoyeke hevbeş e an ku ber bi stratejiyeke nû ve çûyîn e) partî û rêxistinê kurd (yên ku ber bi vê yekê ve nayên) ber bi rûpûşiyên (maskeyên) nû, oportunîzm, keysperestî û hevsengparêziyê nû ve dibe. Ev veguherînên nû neyê dîtin û tenê nebûna şerê çekdarî weke destkeftiyeke mezin were nîşandan, wê demê şêwazê şer û rûyê wê yî nû jî wê were guhertin.

Li Başûr sedemên ku şer di afirandin îro lezgîntir û zêdetir bûne. Mîktara gendeliyan (nelirêtî) û ranta ku bi hezaran kurd li ser dihate (di şerê navxweyî de) kuştin, îro rojeke ji wan weke saleke ji salên 1990'î ye. Li gor belgeyên fermî di nav salên dawî de petrola ku keşfa wê li dinyayê hatiye kirin ji yekê çar'ê(çaryek) wê (nêzîkî 2.5 milyar bermîl an ku varîl) li başûrê Kurdistanê ye. Jixwe 'paşa'yê sermayê Nêçîrvan Barzanî heta radeyekê bikaranîna vê petrolê, ji derveyî hemû kanûn û proseyan diherikîne bûtçeya xwe ya şexsî. Lê di bingeh de ev petrol diherike lûleyên amerîkî û îngilîzan. Li gel vê hin dewletên ku ne di bazinê pergala Ingilîz û Emerîka de ne jê derkevin, ev keşfên petrolê yên nû jî diyar dikin ku projeyên sermayedaran herî zêde li Başûr bi cih dibin. Mînak aktorê herî dawî (yê petrola Teqteqê ku rojê bi sed hezaran bermîl jê der tê) yê tirk Mehmet Sepîl di hevpeyvîneke xwe de dibêje; 'gava ku Qendîl dihate bombebaran kirin, me bi Nêçîrvan Barzanî re bi milyon dolaran peyman îmze dikir.' Ev hevpeyvîn û kesayetên ku li Başûr vê pêvajoyê bi rê ve dibin cihê lêkolîn û nirxandineke berfireh in. Lê ev gotin bi tena serê xwe jî hinek planên li ser kurd û tevgera kurd didin dest.

Bi nêrîneke kurt ji Komploya Navneteweyî û vir de em ketine pêvajoya sermayedariyê li Kurdistanê. Çîroka ku dibêjin 'şerê birakujiyê qediya' an ku bi gotina 'cenabê' Kak Mesûd ku li Başûr zaf tê bilêvkirin, 'şerê xwekujiyê qediya ye' ev e. Qedandina şerê xwekujiyê ye an pêvajoya guncandina sermayê ye?

Bejan Matûr van rojan tiştekî eşkere dike. Dibêje ku Celal Telebanî wesiyetek ji kurê xwe Kubat re hiştiye û gotiye 'piştî ku ez bimrim here tevlî PDK'ê bibe.' Ev rasti nêzî salek e li Başûr tê gotûbêj kirin. Lê Bejan Matûr û yên bi vî rengî dixwazin meselê bikşînin ser hestiyariyek ku mirov dest bi girî bike û bigrî.(!) Gelo Celal Telebaniyê ku ev çend sale bi tena serê xwe muxalefeta PDK'ê dike û wek kesayetek herî polîtîk di civaka kurd de tê naskirin, ewqas saf û xeşîm e. An bi vê hestiyarkirinê, hin derdor gelê kurd apolîtîk dibînin. Na! Me ji lewma anî ziman ku piştî Komploya Navneteweyî, pêvajoya guncandina sermayedariyê dest pê kiriye. Çi balkêş e ku van rojan daxuyaniyeke nû ji aliyê Nêçîrvan Barzanî ve hate dayîn ku dibêje, 'ez li ser reformên nav partiyên siyasî kar dikim.'

Girîng e ku beriya mirov têkeve nava mijara PKK'ê û helwesta siyaseta Başûr, mirov bi rastî jî bizanibe ka mebesta 'reformên siyasî' çi ne û çi nînin? Ji bo van karkirin tê çi wateyê? Yekem, divê bê zanîn ku Neçîrvan tevî ku dema peywira wî ya fermî qediyaye jî lê her roj li ser siyaseta rojane û sermayê di ekranên TV'yan de diaxive û desthilatdariya Başûr ya nû jî di binê siya xwe de hişk dike. Ne tenê patronekî sermayê ye, di heman demê de nûnerekî vê siyasetê ye jî. Agahiyên ku em ji çavkaniyên rasterast digrin, me digihîne pêşbîniyên zelal yê rastiya vê nûnertiyê û ev 'reformên' ku behsa wan tên kirin.

Yek ji van agahiyan ew e ku Nêçîrvan Barzanî bi milyon dolaran pere ji bo bangeşe û geşkirina YNK'ê veqetandiye û heta beşên teknîkiyên vê pêvajoyê jî ji derdor û derfetê xwe dabîn dike. Eger kesên ku dixwazin xweziya xwe û a her kurdekê/î bi vê pêvajoyê bînin nexeydin, emê formula an ku wesiyeta vê pêvajoyê eşkere bikin:

**1-** PDK û YNK di encamên xwesteka yekdestiya siyasî ya bereya kapitalist modernîst de (bi taybet Brîtanya, Îsraîl û Amerîka) bûne yek û rêvebiriya wana siyasî û maddî di binî de dibine yek.

**2-** Ji bo ku nerazîbûnên li hember vê yekdestiya siyaseta Başûr were kontrol kirin û deşarjbûna girseyê pêk were, 'bereya muxalefetê' bi navê Goran hate tanzîm kirin û her cûre piştgirî tê dayîn.

**3-** Mesûd Barzanî wê ji rola xwe ya serokatiya PDK'ê bêhtir weke kesayeteke ku civaka Başur tê de aşbûye û dûrî hemû gendelî, dizî û siyasetên li dijî kurda (heta siyaseta Emerîka jî) bê pêşçav. Heta hin çavkanî dibêjin ku daxuyaniyên wî yên 'netewî' wê ji aliyê 'muxalefetê' ve jî piştgirî bigire da ku bibe sembolek netewî.

**4-** Her pêvajoya ku PKK têkevê (şer an jî agirbest û hrw.) li gel dewleta Tirkiyê ji aliyên welatên din jî weke firsetek wê bi kar bê. Di encama vê siyasetê û aligirên wê yên navnetewî de di her firsetê de wê Başûrê Kurdistanê ji bo kurdan weke alternatîfek (li hember PKK'ê) bê destnîşankirin. Wê jestên siyasî li ser vê rastiyê berdewam bin (mînak, çawa îtîrafkarên ku zû ve teslîmî PDK'ê û YNK'ê bûne, radestî Tirkiyê têne kirin û ev yek jî weke bersiva 'vekirina kurd' tê nîşandan da ku raya giştiya tirk aş bikin!)

Em êdî werin mijara PKK'ê û ka gelo 'qedandina şerê xwekujiyê'di çi astê de ye? Ji aliyekî ve di pirsgirêka kurd de xwestekên siyaseta Başûr ji bo gavavêtin û fedekariyê ji PKK'ê hene; ji aliyên din ve jî bi kes û kesayetên ku ji PKK'ê reviyane û yên li dij PKK'ê, bazareke nû vedike û bi Tirkiyê re û dikeve nav leyîstokan. Ji xwe ji Almanan, Emerîkiyan, Tirkan û her wekî wan li dij PKK'ê çi xebat tên kirin piştgiriyek mezin ji dam û dezgeyên vir tê girtin heta partnertî tê kirin. Li nav ewlekariya Başûr bixwe maseyên 'kontrolkirina PKK'ê' û komkirina agahiyan hatine avakirin. Êdî bûye ku nîqaşên yekîtiya Netewa Kurd û konferansa Kurd di nav vê bazara lîberal de weke derewên nav çîrokên zivistanê tê ber guhê mirov. Yanî şerê birakujiyê qediyaye lê şerê birafirotinê berdewam e, şerê xwekujiyê qediyaye lê şerê xweteslîmkirinê berdewam e, şerê xwekujiyê qediyaye lê şerê xwedanekuştinê berdawam e. Ka temaşekin, Komên Aştiyê li Başûr ji girseya ku PDK'ê jî bi rêxistin kiribû bi hezaran kesî pêşwazîkir û piştî nerazîbûna Tirkiyê ji devên van 'kaka'yan jî coşa kurd çawa wek 'provakasyon'ek hate bi navkirin. Heta îro çi guheriye, ka temaşekin!

# Hukumta AKP'î bi adirî kay keno

ZAZA CEBELÎ

Hasasîyeti şarê kurdan her kes zano ke çiqas muhîm o. Nay ra zî, AKP no hasasîyetî şarê kurdan sero kaykena. No kaykerdiş zî adir o. Adir her kesî weşneno û virneno.

Ez wana ke, AKP her halde, bi aqildê xo rey de nano penîr verd o.

AKP çi dînî rê xizmet kena qet yew çî dîyar nîyo?

Her kes zano ke, qabê pêameyîşî ra, çareserî ra şarê kurdan ra yew plan proje înan çîn o.

Kewtî raşte û edebîyati rişnayişê hêsranê çiman kenê. Wanê wa dayikî mêbermê.

Neyê vatiş weş o, la gelo senîhewa wa dayikî nêbermê. Îmhakerdişî ra, tasfîye ra, tecrît ra.zûrkereyî ra senîhewa hînê? No acemî çaylaqey da xo ra, wanê, ma qay şiyenê şarê kurdan bixapinê. Tayîp efendî edebîyat keno, nêzano se vano. Û vano, Ahmet Kaya, Şiwan Perwer, Sahîdê Nûrsî, Ehmedê Xanî. Ek Tayîb yewî zî nêsinasneno. Wanê kay, no şorisker o, demoqrat o. Neyê hewa qalîkerdiş, qali Tayîbî nîyê, yew tira wano, inohewa waji. O zî anahewa qalî keno. Ney qalî pêro felqey yew konseptî yo.

Tayîp, yew hunerê ey esto ke, labelê nêşto hînê zûrêkereya xo berdewam ko.

Hema leza lezê, dirûyeya xo eşkera keno, numûna bajardê Îzmîrî de, galakerdişê konwoyê DTP ra, wa ke, galakerdişê nîjadperesta raşta. DTP şarî tahrîq kerd o. Neyê hawa zî paştî day nijadperestan.

Vekîlê DTP Hasîp Kaplanî wa ke, her halde, vatişê Serokvezîr Tayîpî sere verd o.

Aqlê selîm merdim ino hewa qalî nêkeno. Tayîp û Bulent Arinç ha bermay, ha hûway , ha nêzana çi wa, heway nizana çîy….. xo tadanê no kiştî û a kiştî ra.

Ek înan de, tikê misqalek samîmîyetey bibînê se, goş danê sereke şarê kurdan, goş danê êlçîyanê pêameyişan. Qabê nîyeti rindey sero, embazê hepsîyan serbest veradaynê.

Mixabin akerdişê paketa Demoqratikî de, operasyonî, îmha, înkar, tecrît û zûrkerey vejya.

Welhesil şîyayîşê pêwajoy qet rind nîyo.

Na ray, AKP kaykerdiş a pîlan kaykena. No kaykerdişê kay ra zî , qama înan, esteyê înan vîyarneno. Wa, hindê zaf hewes nêkê.

No hewes zî qiriqta înan de maneno û xeniqneno merdim î.

Ma wanê ke, roj, rojê giranî yê. Roj rojê xoverodayîşî yê.

Roj rojê vahîrvejîyayîşê îradeyî yo.

Ma bawer kenê ke, şarê Amedî no hasasîyeti îradeyê xo ra, qabê mûqadesî ra cewabê xo xoverodayîşê xo weş nawneno.



# Derba pêyêne Dêrsim

LERZAN JANDIL

Mi nivisê xo yê heştê verî nîya qedêna bî. Rêyêna: Koçgîrî derba verên a. Eke derba verêne mêro famkerdene, derba pêyêne (Dêrsim) kî nêna famkerdene.

Eke zulimo ke Nurettîn Paşa, yaver û zamayê ey Abdullah Alpdoganî û Topal Osmanî Koçgîrî de kerd, mêro famkerdene, derba pêyêne (Dêrsim) kî nêna famkerdene.

Eke talan û çapûlo ke Koçgîrî de amê kerdene, mêro famkerdene, derba pêyêne (Dêrsim) kî nêna famkerdene.

Eke vatişê Nurettîn Paşayî: "Ma zoyî qedênayî nika dorê amê loyan." mêro famkerdene, derba pêyêne kî nêna famkerdene.

Eke vatishê Wekîlê Kuthaya Hakki Naşîtî: "Nê koyan de yew dînê de aqil û mantiqî ra teber êno cuyene." mêro famkerdene, derba pêyêne kî nêna famkerdene. Eke vatişê Y. Mazhar Arenî: "Zekaya kurdan qasê zekaya heywanan a. Yanê zekaya yew Kurdê Dêrsimî qasê zekaya yew heywanî, yew cinawirî ya." mêro famkerdene, derba pêyêne kî nêna famkerdene.

Eke vatena Îsmet Paşayî ya roja 31.08.1930'î: "Na welat de tenya şarê Tirkî wayirê heqanê nîjadkîyan taleb kerdene wo. Weko bîn heqa qet kesî wayirê heqêde nîyanêne nîyo." mêro famkerdene, derba pêyêne kî nêna famkerdene.

Eke Fevzî Çakmak mêro famkerdene, derba pêyêne kî nêna famkerdene.

Se vano Fevzî Çakmak? Çakmak 18.09.1930 de derheqê Kurdan de fikir û talebanê xo sey yew rapore Serekwezîr û Wezîrê karê zereyî re nuşneno. Çakmak, na ropore de kaleka zaf çîyan de nîna vano: …"Erzingan de 10.000 Kurdî est ê. Nê Alewîtîye ra kî îstîfade kenê û wazenê dewanê tirkan yê ke est ê, bikerê Kurt û ziwanê kurdkî bikerê vila. Çend serî ra dime şîkîno bêro endîşe kerdene, ke Kurdîye/Kurdênî Erzinganî pêro îşqal bikero. Zaf dewê tirkanê Alewîyan, ke bi edetanê xo kî tirk ê, Seba ke bawer kenê, ke Alewîtîye Kurdîye îfade kena, ziwanê maya xo ca verdo, kurdkî qesê kenê…. „

Eke vatişê Wezîrê Adeletî M.E. Bozkurtî yê roja 19.09.1930'î: "Kesê ke na welat de nîjadê tirkey ra nênê, yew heqa xo est a, heqa xulam bîyene, heqa kole bîyene. Dost û dijmenî hetanî koyî kî na rastîye nîya bizanê." mêro famkerdene, derba pêyêne kî nêna famkerdene.

Eke Qanunê Îskanî mêro famkerdene, derba pêyêne kî nêna famkerdene.

Eke Qanunê Tuncelîye mêro famkerdene, derba pêyêne kî nêna famkerdene.

Eke qedexekerdena ziwanê kurdan mêro famkerdene, derba pêyêne kî nêna famkerdene.

Eke şexsê Sey Rizayî de vatişê S. Gezgînî derheqê Qizilbaşan de: "Ma musayîme ke no yobazo telikkewe û cubekewe yo ke îda keno ke, o cisnê resûlan ra ameyo, yew keşîşê (papaz) katolîkan ra zêdêrî putê xo est bîyê. Çadira ey de yew koleksîyonê îstavrozan (xaç), her derdî re derman tacî, pirtukê dînkî bi Armenkî amê dîyene.

Ma Sey Riza vile de putî, dest de çek, mîyane de şimşêr û virane de Încîl nêşone re "Pîyer Lermît"êde neweyî? O (yanê Lermît) … samîmî bî. Lê kesê ke sedseran ra nat dekoranê Dêrsimî yê berzan de komedî kay kenê, hem zulim de înan ra berzêrî bî, hem kî bêîman bî. …" mêro famkerdene, derba pêyêne kî nêna famkerdene.

Eke ha zere de ha teber ra tenya û bêkes mendena Dêrsimî mêro famkerdene, derba pêyêne kî nêna famkerdene.

Eke nê û faktorê bînî pêro pîya amayî famkerdene, o taw demêde bîn dest keno ci, û derba pêyêne yêna famkerdene.

ROJEV

**Zozan Basın Yayın Adına**
**İmtiyaz Sahibi:** Eser UYANSIZ
**Yazı işleri Müdürü:** Mustafa AGGÜL

**Yönetim Yeri:** Diclekent Bulvarı Termil Apt. Kat:3 No: 9 Kayapınar / DİYARBAKIR
**İdare Tel:** 0 (412) 251 38 88
**Yayın (Weşan)**
**Tel:** 0 (412) 237 48 91 **Fax:** 0 (412) 237 48 89
**Baskı(Çap):**
**Stenbol:** Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basin Yayın Tan. San. Tic. Ltd. Şti., Telsizler Mevki
Beşyol mah. Akasya Sok. No:23/A Küçükçekmece / İSTANBUL
Tel:0 (212) 580 63 81
**Edene:** Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtçılık, AŞ. İstiklal Mah. İstiklal Cad. No:44 Seyhan/ ADANA
**Yaygın Süreli Yayındır**

www.arsivakurd.org

# Nasnameya 3 gerîlayan hate aşkerakirin



Hîwa Nazimî



Muhammed Hasanzade



Mahmut Azîzî

**Nasnameyên 3 gerîlayên ji rojhilatê Kurdistanê ku di pevçûnên li Botan û Zagrosê de jiyana xwe ji dest dabûn hatin aşkerakirin.**

**Di daxuyaniya ku hate kirin de hate diyarkirin ku Mahmut Azîzî (Armanc Merîvan) yê ku ji bajarê Merîvanê ye di 2007'an de li herêma Bestaya Botanê di pevçûnê de jiyana xwe ji dest daye. Muhammed Hasanzade (Karker Salmas) û ji Salmasê ye di 27'ê gulana 2009'an de li herêma Çerçelaya Zagrosê di pevçûnê de jiyana xwe ji dest daye. Dîsa hate daxuyandin ku Hîwa Nazimî (Zana Mahabad) ê ji bajarê Mehabadê ye di 2007'an de li herêma Gabar a Botanê di pevçûnê de jiyana xwe ji dest daye.** *QENDÎL (ANF)*

# Girtî nayên tedawîkirin

Girtiyê PKK'î Cebraîl Vural ku li Girtîgeha Tîpa M a Mîdyatê ye, ji ber nerehetiya mîdeyê ew rakirin nexweşxaneyê, lê nehat dermankirin û ew paş de şandin girtîgehê. Vural, hîn li benda dermankirinê ye.

Girtiyê PKK'ê Cebraîl Vural ku cezayê muebetê lê hatiye birîn û li Girtîgeha Tîpa M a Mîdyatê tê girtin, di nameya ji malbata xwe re şand de diyar kir ku mîdeya wî diêşe, lê nehatiye dermankirin.

Vural, anî ziman ku dema çûye Nexweşxaneya Dewletê ya Mîdyatê rastî êrîşa gotinên çawişekî pispor hatiye.

Vural, da zanîn ku bijîşkê li nexweşxaneyê jî ew li benda pisporekî di betlanê de ye hiştiye û gotiye "Cerah dê 15 rojên din bê". Vural ku careke din ji nerehetiya mîdeya wî, ew radikin heman nexweşxaneyê vê carê jî bi hinceta cîhaza endoskopiyê nîn e, nehatiye dermankirin. **AMED**

# Çelê hatiye dagirkirin

Cîhan ESEN - COLEMÊRG / ANF

**Navçeya Çelê di warê leşkerî de wekî ku hatiye dagirkirin. Li navçeya ku nifûsa wê 7 hezar û 500 e, ji 22 hezaran zêdetir leşker û polîs hene. Ango ji bo kesekî 3 leşker dikevin**



Çelê, navçeyeke biçûk a Colemêrgê ye û nifûsa Çelê jî 7 hezar û 500 e. Ji ber rewşa wê ya stratejîk, piştî damezirandina Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) ji nû ve hat dagirkirin. Êdî hatiye wê asteke ku ji 22 hezarî zêdetir leşker, tîmên taybet, polîs û cerdevan hene. Wisa dixuye ku li Çelê, ji bo her kesekî 3 leşker an jî polîs hene.

Bi taybetî jî piştî belavbûna têkoşîna çekdarî ya PKK'ê, dewleta tirk li dijî gelê herêmê 'Konseptên taybet' da destpêkirin. Piştî vê rewşê ji aliyê leşkerî ve navçe ji nû ve hat dagirkirin û li dijî gel polîkayên asîmîlasyonê bi pergalake hatin meşandin.

Li Tirkiyeyê, li gotî nifûsê herî zêde leşker li Çelê heye. Li navçeyê peywirdarên dewletê yên girêdayî Fermandariya Tugayê ya Navçeyê, Fermandariya Cendermeyan, Tabûra Cendermeyên Komando, tîmên ewlehiyê, qereqol û tîmên ewlehiyê yên navçeyê, bi gelemperî zêdetirî 22 hezaran e. Leşker, bi piranî li herêmên wekî Ertûş, Ereş, Şivarêzan, Bîlecan, Şivişk û Erbûşê hatine bi cih kirin.

Li Çelê, li gel tîm û tabûrên leşkeran, gelek cerdevan jî hene. Ji ber zext û zordariyên ku dewlet ji bo cerdevaniyê li ser gelê herêmê dimeşîne, gelek kes neçar ma ku koçî Wan, Colemêrg û hin bajarên mezin ên Kurdistan û Tirkiyeyê bikin. Lê hinek kes jî ji ber ku derfetên wan ên koçberiyê tunebûn, neçar man ku cerdevaniyê bipejirînin.

Tîma Xençerê jî ku li herêmê gelek bûyerên wekî kuştinên kiryar nediyar, xesp, dizî, talan û destdirêjiyan dikir jî piştî ku di çapemeniyê de hatin teşhîr kirin niha bêdeng in. Lê dema ku mirov li hin bûyeran dinêre, dibîne ku ev tîm hêj nehatiye belavkirin û heke dema wê bê, dîsa derdikeve holê û bûyerên xwe yên qirêj didomîne. Piştî ku navê wan di çapemeniyê de derket, ev demekê ye xuya nakin. Ji ber vê jî di nav gel de hinek rihetê çêbûye lê gelê Çelê hêj jî bi baldarî tevdigere.

**Artêş mayinan bi cih dike**

Artêşa Tirk, ji sala 1988'an û vir de bi awayeke pergalî li her derê Çelê mayinan bi cih dike. Hejmara van mayinan ji aliyê tu kesî ve nayê zanî û li gel vê yekê gel destnîşan dike ku wekî hejmara leşkeran, di hêla hejmara mayinan de jî rekor li Çelê ye.

Her çiqas çapemeniya alîgir li ser nesekine jî li Çelê hêj jî mayinên dewletê mirovan dikujin an jî birînda dihêlin. Mayin bi piranî di patîka, rê û li cihên ku sewal li wê dimînin tên bi cih kirin û ev jî jiyana gel a rojane zehmetir dike.

Ji ber mayinên dewleta tirk gelek mirovên sivîl jiyana xwe ji dest didin an jî birîdar dibin. Lê dewlet bi israr dixwaze ku van mayinan wekî yên PKK'ê nîşan bide. Gelê herêmê bi awayeke zelal diyar dikin ku PKK tenê bombeyên bi kûmandayan bi kar tîne û dîsa PKK bombe û mayinên xwe li cihên ku mirovên sivîl dijîn bi cih nake. Ji ber vê yekê jî mayinên ku sivîlan dikujin tenê yên artêşa tirk in. Gel tîne ziman ku antîpropagandayên dewletê nagihîjin armanca xwe û ew tu carî baweriya xwe ya ji PKK'ê winda nake.

**Xebatên leşker û polîsan**

Navçe biçûk e tu aktîvîteyên civakî tune ne. Leşker, serleşker û polîsên li herêmê, keçên kurd bi qewlê zewacê dixapînin û wan dikşînin aliyê xwe. Bi vî awayê keçÊn kurd ji çand û hunera wan dûr dixin. Li gorî lêkolîneke, her sal herî kêm 7-8 keçên kurd ji aliyê leşker, serleşker û polîsan ve tên revandin. Herî dawî xwendekareke lîseyê ji aliyê polîsekî ve hat revandin. Polîs, keçikê bi qewlê zewacê xapandiye û wê biriye Îzmirê. Li wê derê jî xwestiye ku wê bi hin zilamên din re bazar bike. Ev jî girîngiya meseleyê zêdetir dike. Keçên ku bi vî awayî tên revandin, bi awayekî dikevin nav fihûşê. Bûyerên xwekuştinên keçên ciwan ên li herêmê jî girîngiya vê rewşê derdixin holê.

Dîsa Çelê, ji aliyê vexwarina araqê ve jî di asteke bilind de ye. Vexwarina araqê ji ber zext û polîtîkayên dewletê her diçe zêdetir dibe. Dîsa zêdebûna hêzên dewletê yên ku sê qatê nifûsa gelê navçeyê û tevgerên wan ên ku araqê bi gel didin hezkirin jî bandoreke mezin li ser ciwan û zarokan dike. Li navçeyê serxweşiya memûran jî êdî bûye tişteke rojane. Dewlet vê rewşê dizane lê ji ber polîtîkayên xwe mudaxaleyê vê rewşê nake.

Çelê ji aliyê leşker û cerdevanan careke din hatiye dagirkirin û wergeriyaye biryargeheke. Li gel vê yekê jî dewlet dixwaze senaryoyên xwe yên qirêj jî li wê bi kar bîne. Heke ku yek qala 'açilimê' bike, divê ku pêşiyê vê pirsê bibersivîne ku ka li cihekî bi nifûsa 7 hezar û 500'î, 22 hezar hêzên ewlehiyê çi dikin?

# 'Polîsan molotof danîn komeleyê'

Rêveberên Mala Çand û Demokrasiyê û esnafên derdorê diyar kirin ku piştî polîsên sivîl bi ser Mala Demokrasiyê de girt, torbeyek molotof danîn hundirê komeleyê û piştre torbe nîşanî çapemeniyê dane û gotine "Me torbeyek bombe dît".

Mala Çand û Demokrasiyê ya li taxa Okmeydani ya navçeya Şîşlî, bi fermana Dozgeriya Şîşlî ji aliyê polîsên sivîl ve rastî serdegirtinê hat. Di serdegirtina ku ji nêzî 200 polîsan ve pêk hat de polîsan kolan dorpêç kirin û nêzî 2 saetan lêgerîn kirin. Polîsan di encama serdegirtina komeleyê de 16 kesên li komeleyê bi lêdanê binçav kirin.

Piştî serdegirtina komeleyê, Midûriyeta Polîsan angaşt ku li hundirê komeleyê molotof hatine bi dest xistin. Li dijî vê yekê rêveberên komeleyê û esnafên derdorê angaştin ku polîsan di serdegirtina komeleyê de torbeyek molotof danine hundirê komeleyê.

Di dema serdegirtina komeleyê de rêvebera komeleyê Meryem Bulut, diyar kir ku zêdeyî 100 polisan deriyê komeleyê şikandin û bi zorê ketin hundirê komeleyê. Bulut, anî ziman ku piştî serdegirtinê 16 ciwan bi darê zorê û bi lêdanê kirine binçavan. Bulut, dema serdegirtinê wiha got: "Komek polîs bi zorê ketin hundir û hemû kes avêtin erdê. Neheqî li me tevan kirin. Li hundir tu tişt tunebû. Piştre hatin torbeyek nîşanî me dan û gotin "Me bombe dît". Lê belê li komeleyê tu tişt tunebû wan ji derve anîne."

Ji rêveberê komeleyê Mehmet Sonmez jî, diyar kir ku dema serdagirtinê de polîsekî sivîl ku di şibakê de ketiye hundir poşeteke di destê xwe de daniye hundirê komeleyê û pişt re ketiye hundir.

Sonmez, diyar kir ku bi komployekê rû bi rû mane û wina dom kir: "Cihê polîs ketê min dît. Poşetek di destê wî de hebû û danî odeya dawî, pişt re jî got 'Min ev dîtin' û nîşanî hemû kesî da. Komplo li me kirin." Esnafekî ku nexwest navê xwe bi de jî, anî ziman ku dema serdagiritinê de kesek bi torbeyekî mezin ê ketiya şibaka vekirî ya komeleyê ya pişt û wiha axivî: "Di dema serdagirtinê de çima kesek bixwaze tiştekî bixe hundir? Dibe ku polîsan ew torbe xisitbûn hundir." **STENBOL**

# 'Em xizmetê nadin we'

Li Şirnexê polîsan mora xwe li pêkanîneke skandal xistin. Îlaneke ku li ser deriyê Emniyeta Şirnexê hate daliqandin de polîsan nivîsa "ji er ku zarokên we di çalakiyê de ne em nikarin xizmetê bidin we" nivîsandin.

Di rojên dawî de li gelek deverên Kurdistan û Tirkiyeyê ji boprotestokirina rewşa girtîgehê ya Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan çalakî têne lidarxistin. Li Şirnexê polîsan îleneke balkêş li ser deriyê Enmiyeta Şirnexê daliqandin. Welatiyên ku ji bo karên ehliyet, ruhsat û hwd. diçin emniyetê dema ku îlanê dibînin matmayî dimînin. Di îlana ku hatiye daliqandin de wiha tê gotin: "Personelên me, ji ber ku çalakiyê zarokên we de peywirdar in em xizmetên, ehliyet, ruhsat û pasaportê nadin we." Di îlanê de gotina "zarokên we" rastî nerazîbûna welatiyan hat. **ŞIRNEX**



# 16 sal in qurnefîlan datînin

*Di 16'emîn salvegera bombekirina rojnameya Ozgur Ulkeyê ku ji kevneşopuya Çapemeniya Azad tê de xebatkarên Çapemeniya Azad qurnefîl danîn ber avahiya rojnameyê. Ersîn Yildiz ê di encama bombekirinê de hatibû qetilkirin jî hate bibîranîn. Di bîranînê de Gerînendeya Giştî ya Rojnameya Gunlukê Fîlîz Kocalî axivî . Koçalî got ku rojnameyên ku ji kevneşopiya Çapemeniya Azad tên li dijî bombekirinan, girtina xebatkaran, pêkutiyan, girtina rojnameyan, sansuran dîrokeke têkoşînê ya bê hempa afirandiye. Koçalî got ku ew ê xwedî li vê kevneşopiyê derkevin. Koçalî got ku ew ê rastiyan îro pê de jî tavîzan nedin. Piştî axaftinan xebatkarên Çapemeniya Azad çûn li ser Gora Ersîn Yildiz.*

# Kompîturên şaredariyê dizîn

Mala Ciwanan a Mehmet Işikçi ya Şaredariya Yenîşehîra Amedê hate şêlandin. Hate hînbûn ku kompîturên Mala Ciwanan hatine dizîn. Cîgira Şaredarê Yenîşehîrê Hafîze Îpek diyar kir ku dibe ku ev bûyer bi awayeke plankirî hatiye kirin. Îpek got ku 9 kompîturên wan hatine dizîn. Tenê kesek nikare vê yekê bike. Kompîturên ku hatine dizîn ji aliyê Telekomê ve ji bo şaredariyê hatine hîbekirin. Îpek daxuyand ku li ser şopên tiliyan lêkolîn tên kirin. **AMED**

# Wêne... Wêne... Derew

## Parêzerê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, Cengîz Çîçek wêneyên ku Wezareta Dadê bi armanca xweşnîşandana şert û mercên girtîgeha Îmraliyê li çapemeniyê belav kirin ji bo me nirxandin



### 'Hucreya Ocalan ev nîn e'

***Wêne 1-2:*** Parêzer Cengîz Çîçek li ser van du wêneyan wekî hucreya Ocalan hatiye nîşandan, ev nirxandin kir: 'Li gorî daxuyaniya Wezareta Dadê ev 2 wêne hucreya ku muwekîlê me tê de tê hiştin nîşan didin. Ev ne rast e. Li gorî agahiyên ku muwekîlê me bi me re parve kirine, pencereya ku bi deriyê vedibe hewşa berhewayê di hucreya wî de nîn e. Pencereya hucreya ku muwekîlê me tê de tê hiştin ji 3'yî 1'î vê pencereyê ye û li jorê derî ye. Tiştekî din jî heye. Di wêneyan de deriyê ku vedibe hewşa berhewayê vekiriye. Lê rastî ne wisa ye. Berî nîvro nîv saet, piştî nîvro nîv saet, bi giştî rojê saetekê ji bo ku muwekîlê me derbikeve hewşê tê vekirin. Wekî din tim girtî tê hiştin.





### Vî wêneyî wezîr derewand

***Wêne 3:*** Parêzer Çîçek anî ziman ku ev wêneyê kabîna hevdîtina bi parêzeran re ye. Çîçek wiha got: "Ev wêne bi tenê nîşan dide ku standartên ji bo Tîpa F derbasdar nîn in. Muwekîlê me ji deriyê ku pelên gulê li qeraxê dixuyê dikeve kabîneya hevdîtina bi me re. Em jî ji aliyê din ve li cihê ku bitenê serê kursiyê lê dixuyê rûdinin. Di navbera me de 5-6 metre mesafe heye û li pişt caman em bi hev re diaxivin. Dualî pencere hene û dema em dikevin hevdîtine derî nîvvekirî tên hiştin û gardiyan bi dengdanê hevdîtina me tacîz dikin. Di wêneyê de naxuyên, li hemberî vê kabînê hin kabînên din ên nîvqasê vê mezin hene. Ev kabîna ku tê dîtin bi taybetî ji bo muwekîlê me hatiye çêkirin. Ev jî derewa wezaretê nîşan dide.



### 11 sal in jê îstîfade nekiriye



***Wêne 4-5:*** Parêzer Çîçek ji bo van wêneyan jî wiha got: Di wêneyekî de maseya tenîsê dixuyê. Lê muwekîlê me ev 11 sal in li Îmraliyê tê girtin û rojekê bi tenê jî ji vê salonê îstîfade nekiriye. Her wiha odeya hobiyê dixuyê. Ji bo vê odê jî heman tişt pêkan e. Li gorî Qanûna 5275 xala 25 benda H hatiye destnîşankirin ku jêîstîfadekirina ji van derfetan li gorî rêziknameya navxweyê ya saziyê pêkan e. Ligel ku em parêzerên wî ne, çiqas me daxwaz kiribe jî heta niha rêziknameya Girtîgeha Îmraliyê ji me re nehatiye dayîn. Her wiha girtiyên neqilkirine Îmraliyê jî heta niha bi muwekîlê me re nehatine cem hev. Gotina muwekîlê me ya 'mirinê nîşanî min didin, dixwazim bi tayê razî bibim' vê rewşê tam vedibêje.

## Ji 500 PKK'iyan hişyariya Ocalan

500 PKK'iyên li Girtîgeha Tîpa D a Amedê dimînin xwestin ku di zûtirîn demê de şert û mercên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bên başkirin û ev daxwaz anîn ziman: "Ji bo ev pêkanînên bi talûke bi dawî bibin, lazim e pergala Îmraliyê bê bidawîkirin, CPT û DMME ku berpirsyarên vê pergalê ne xwedî li berpirsyarên xwe derkevin û di encama lêkolînên li Îmraliyê de dawiyê li mirinê bînin."

Girtiyên PKK'î yên li Girtîgeha Tîpa D a Amedê têkildarî xirabkirina şert û mercên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan daxuyaniyek dan çapemeniyê. Daxuyaniya ji aliyê Sedat Akgok û Nîhat Durmuş ve hate kirin de, xapandina di bin navê çareseriyê de tê meşandin, hate destnîşankirin. Di daxuyaniyê de hate diyarkirin ku gelên Tirkiyeyê ketine nav bendewariyek mezin û ev tişt hatin gotin: "Ne berî hevdîtina li TBMM'yê û ne jî piştre gavek berbiçav nehatiye avêtin. Her roj pêkanînên xirabtir derketine holê. Niha em dibînin ku AKP dixwaz bi navê 'hewldana demokratîk' rêxistinbûna gelê kurd belav bike, serokatiya kurdan îmha bike û dawiyê li têkoşîna gelê kurd bîne. Derketiye holê ku bi kirinên AKP'ê ne pirsgirêka kurd çareser dibe ne jî Tirkiyeyek demokratîk tê afirandin."

**Faşîzma AKP'ê tê avakirin**

Di daxuyaniyê de hate derbirîn ku AKP'ê hêzên navneteweyî jî hildane cem xwe û hewl dide ku muxalefeta demokratîk a kurd biqedîne û ev tişt hatin gotin: "Qasî du qat temenê zarokan ceza li wan tê birîn. Îşkence û pêkanînên li girtîgehan zêde dibin. Ji ber girtina kurdan cih li girtîgehan nema ye. Her roj girtin û serdagirtinên şevê zêde bûne. Îşkencekarên kurdan nayên darizandin û sûcên xwe didomînin. Axaftinên herî mahrem ên mirovan tên guhdarkirin û li hemberî mirovan wekî şantajê tê bikaranîn. Azadiya ramanê û xwe îfadekirinê bi zora polîsan ji holê tê rakirin."

Li ser mijarê di daxuyaniyê de hate bîrxistin ku CPT, rêxistinên civakî, nûnerên saziyên civakî, rewşenbîr û gelê kurd gelek caran pergala Îmraliyê bi tundî şermezar kiriye û wiha hate gotin: "Di bin navê başkirina şert û mercan de xirabkirina şert û mercan ji bo me zelal e ku êdî Îmralî bûye bîra mirinê. Armanca vê pêkanînê ew e ku Ocalan bixin cihek 6 metrekareyî û bênefes bihêlin."

**'Berpirsyar AKP ye'**

Di daxuyaniyê de hate xwestin ku Wezareta Dadê têkildarî pêkanînên li Îmraliyê di zûtirîn demê de daxuyaniyekê bide û tedbîrên pêwist bigire û ev tişt hatin gotin: "Ji bo ev pêvajoya bi talûke dawî bibe, laim e berpirsyarên pergala Îmraliyê û Tîpa F, CPT û DMME berpirsyariya xwe bi cih bînin û bêyî dereng bimînin li Îmraliyê lêkolînê bikin. Em girtiyên PKK'î yên li Girtîgeha Tîpa D a Amedê bang li hemû derdorên demokratîk û gelê kurd dikin ku li hemberî mijarê hîstiar bin û dawiyê li vê bîra mirinê bînin." Di daxuyaniyê de hate destnîşankirin ku 5 PKK'iyên girtî bi vê armancê di 1'ê kanûnê de ketine çalakiya grevê ya bêdem û heta Ocalan digihe tendurisiya xwe dê ev çalakî bêdem berdewam bike. **AMED (DÎHA)**

## Li Êlihê 61 saziyên sivîl name şandin

Li Êlihê, 61 saziyên sivîl û civakî, bi armanca başkirina şert û mercên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ji TÎHV, ÎHD, TTB, TBB, MAZLUMDER û Komîsyona Mafên Mirovan a Parlementoyê re name şandin.

Li Êlihê 61 saziyên sivîl û civakî, bi armanca başkirina şert û mercên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan li ber Postexaneya Êlihê civîyan û daxuyanî dan çapemeniyê. Endam û nûnerên 61 saziyên sivîl ku li ber Postexaneya Êlihê civîyan, li TÎHV, ÎHD, TTB, TBB, MAZLUMDER û Komîsyona Mafên Mirovan a Parlementoyê re name şandin. Di şandina nameyan de rêveberên DTP'ê û nûnerên saziyên sivîl amede bûn. Beriya ku nameyan bişînin li ser navê 61 saziyên sivîl Serokê MAZLUMDER'ê Murat Çîçek daxuyanî xwend. Çîçek, diyar kir ku niqaşên li ser şert û mercên Ocalan wan dixin nava şik û gumanan û wiha got: "Ji bo aloziya civakî pêk neyê û Tirkiye nekeve nava pêvajoyek xirab divê şert û mercên Ocalan bêne başkirin. Ji bo başkirina mercên Ocalan û CPT heyetek serbixwe bişîne Îmraliyê û lêkolîn bike, em wekî saziyên sivîl û civakî em ji saziyên eleqedar re nameyên xwe rêdikin. **ELIH**

## Li Bedlîs û Boluyê girtî ketin grevê

Li Bedlîsê 3 girtiyên jin ên li Girtîgeha Tîpa E ya Bedlîsê, bi armanca şermezarkirina tecrîda li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi awayekî bêdem dest bi gireva birçîbûnê kirin. Li Boluyê 3 girtiyên PKK'î li Girtîgeha Tîpa F tên girtin, dest bi greva birçîbûnê kirin.

Li Girtîgeha Tîpa E ya Bedlîsê 3 jinên doza PKK'ê Evîn Yildirim, Nuriye Gençer û Hulya Taşar bi armanca şert û mercên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar bikin dest bi gireva birçîbûnê kirin. Girtiyên jin ku bêdem dest bi gireva birçîbûnê kirin, diyar kirin ku heta rewşa Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan baş bibe dê gireva xwe bidnomînin.

Li Girtîgeha Tîpa F a Boluyê 3 girtiyên PKK'ê bi armanca balê bikşînin rewşa ser Ocalan û şert û mercên Ocalan şermezar bikin bi awayekî bêdem dest bi gireva birçîbûnê kirin. Li heman girtîgehê hefteya borî dîsa 120 girtiyên PKK'î bi armanca darvekirinên li Îranê û êrîşên li girtîgehên Îranê şermezar bikin 2 rojan çalakiya gireva birçîbûnê pêk anîbûn. **ENQERE**

## Kepeng nehatin vekirin

Li Qosera Mêrdînê û Hezexa Şirnexê esnafan bi boneya şermezarkirina şert û mercên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ên Girtîgeha Îmraliyê dikanên xwe venekirin.



Çalakiyên şermezarkirinê yên ji bo şert û mercên Ocalan ên Girtîgeha Îmraliyê didomin. Piştî esnafên Nisêbînê duh jî esnafên navçeya Qoserê dikanên xwe venekirin. Li navçeyê tedbîrên ewlehî yên berbireh hatin giritin.

Her wiha li Hezexa Şirnexê jî esnafan ji bo protestokirina girankirina tecrîda li ser Ocalan dikanên xwe venekirin. **MÊRDÎN**

## Qasidên aştiyê li Geverê saziyên sivîl ziyaret kirin

Endamên Komên Çareseriya Demokratîk û Aştiyê yên bi banga Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji Qandîl û Maxmûrê hatin Tirkiyeyê, li Navçeya Geverê saziyên sivîl û civakî ziyaret kirin.

Endamên Komên Çareseriya Demokratîk û Aştiyê yên bi banga Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji Qandîl û Maxmûrê hatin Tirkiyeyê, di çarçoveya gera xwe de çûn Navçeya Geverê û saziyên sivîl ên civakî ziyaret kirin. Endamên Komê Elîf Uludag, Huseyin Îpek, Îsmaîl Ayaz, Bulent Aka, Zehra Tunç, Îsmaîl Ayaz, Fatma Îzel, Seyît Şedal, Menekşe Soydan, Mîkaîl Soydan Şaredariya Geverê ziyaret kirin. Piştî ziyareta şaredariyê çûn şaxên KESK, Baro, DTP, Odeya Bazirganiyê, KURDÎ DER, Esnafên Sîteya Pîşesaziyê, Komeleya Keyeyan, Odeya Sinhetkar û Esnafan, Odeya Şoforan û Buroya Şîrketa Firatê ziyaret kirin. Di ziyaretan de Endama Koma Qandîlê Elîf Uludag, têkidarî armanca hatina xwe agahî dan û xwest her kes armanca hatina wan rast fam bike û bi wate bike. Uludag, anî ziman ku gelê kurt tu carî aştiyek bê rûmet qebûl nake û ji CPT'ê jî xwest ku heyetek serbixwe bişîne Îmralî û mercên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan bê başkirin.

Endamên Komê dê îro saet di 13.00'an de beşdarî mîtînga ku li ber Mizgefta Hacî Ubeyt pêk bê bibin. **COLEMÊRG**

www.arsivakurd.org

# Krîtera navbera Obama û Erdogan

**Kovara The Economîst beriya ku Erdogan biçe Washingtonê li ser hevdîtina Obama û Erdogan analîzek weşand û di analîzê de aşkera kir ku krîtera esasî ya hevkariya bi DYA'yê re polîtîka Tirkiyeyê ya gel Îranê ye**

Kovara The Economîst a Îngilistanê li ser serdana Erdogan a Amerîkayê ya duzbe rawestiye, krîtera nav Serokdewletê Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê (DYA) Barack Obama û Serokwezîrê Tirk Tayîp Erdogan diyar kir. Da zanîn ku krîtera ku pîvana nav Obama û Erdogan diyar bike ne şandina leşkeran a Afganistanê ye. Pîvana esasî dê helwesta Erdogan ya li hemberî Îranê be.

Di vê çarçoveyê de The Economist di analîza xwe de vedibêje ku Erdogan dibe ku daxwaza Amerîkayê ya ji bo şerê Afganistanê şandina leşkeran red bike û sedemê vê redkirinê ji bo Obama îzah bike. Lê têkiliyên Tirkiyeyê yên bi Îranê re ji bo berdewama têkiliyên bi DYA'yê re mijareke krîtîk e.

Kovara The Economist di hejmara dawî de dema têkiliyên nav Tirkiye û Rojava dinirxîne vedibêje ku rexneyên wek Tirkiye ji Rojava dûr dikeve rexneyên nepixandî ne. Tê îdiakirin ku Erdogan di serdana DYA'yê de 'di sicîla xwe ya bi Rojava re de israr bike.

Di analîzê de tê aşkerakirin ku Erdogan li DYA'yê ji bo şerê Afganistanê bi daxwaza şandina leşkeran re rû bi rû bimîne.

Ancax kovar hîsa AKP'ê ya ji bo Afganistanê jî vedibêje. Diyar dike ku Tirkiye jî Afganistan jî welatên misilman in. Ji ber vê jî Erdogan dê nexwaze ji bo şer leşkeran bişîne Afganistanê. The Evonomist destnîşan dike ku dê hin analîst vê helwestê wek teyîtkirina dûrketina ji Rojava qebûl bikin.

**Helwesta ji bo Îranê krîter e**

The Economist helwesta Erdogan a erênî ya ji bo Îran û Sûdanê, rexneyên Erdogan ên li Israîlê jî vedibêje û wiha pê de diçe: "Ev geşedan derfet didin ku analîst bêjin Erdogan 'îslamîst' e." Kovar bal dikişîne ser êrîşên Stenbolê yên sala 2003'yan ku cihû kiribûn hedef. Li ser vê jî nirxandinekê dike. Di nirxandinê de vedibêje ku heke leşkerên tirk li Afganistanê gule bera misilmanan bide dê li Tirkiyeyê mîlîtanên îslamîst ên radîkal û bûyerên wisa tundîtije zêdetir bibin.

Nirxandina li ser têkiliyên Tirkiye û DYA'yê jî bal dikişîne ser baregeha Încîrlîkê. Vedibêje ku DYA di hemû operasyonên Iraqê de ji Încîrlîkê sûd werdigere. Lê mijara herî esasî ya analîzê li ser Îranê ye. Tê aşkerakirin ku ne hêsan e ku Erdogan karibe mafdariya helwesta xwe ya piştgiriya nukleerê ya dide Îranê ji Obama re vebêje. Tirkiye di Konseya Ewlehiya Neteweyên Yekbûyî de endamtiya xwe ya demî didomîne. Tê gotin ku dema dengdana ambargoyê bê kirin dê cihê Tirkiyeyê jî diyar bibe. Heke deng bide Îranê dê cihê xwe pesend bike. Na ku dengê xwe ji bo ambargoyê bi kar bîne dê cihê xwe ligel Rojava pesend bike. Ev encam ji bo têkiliyên siberojê yên Tirkiye û DYA'yê wek krîtera esasî tê diyarkirin.

**Hîsên otokratîk ên Erdogan**

Di analîza kovarê de rexneyên wek Erdogan hewldana kêmkirina erka artêşa tirk ne ji bo endamtiya YE'yê ji bo desthilatdariya oldar damezirîne didomîne, doza Ergenekonê jî parçeyek vê planê ye û cezayê ku li koma Doganan ya çapemeniyê jî di ber re rêz dike. Dide zanîn ku ev rexne rast in û ew jî tevî vê dibin û wiha pê de diçe: "Bê guman hîsên Erdogan ên otokratîk hene. Doz li rojnamegeran, karîkatorîstan jî dide vekirin. Li gunehkarê mafên Mirovan Omer El Beşîr hat û ew hemêz kir. Di qada cemawerî de jî her diçe rist û mîsyona îslamî zêde dike. Ji ber vê dibe ku daxwaza Tirkiyeyê ya endamtiya Yekîtiya Ewropayê ji holê rake."

Kovar helwesta Tirkiyeyê ya çareseriya pirsgirêka kurd û pêşxistina têkiliyên Tirkiye-Ermenistanê wek hewldanên pêşkêtî destnîşan dike û vedibêje ku Tirkiye bi van hewldanan sinyal dide ku ew ji Rojava xwe dûr naxe.

**Lê muxalefet li ku disekine**

The Economist muxalefeta Tirkiyeyê jî bi kurtasî vedibêje. Dide zanîn ku Denîz Baykal û CHP di hemû polîtîkayên xwe de êrîşê qanûnên ji bo endamtiya YE'yê hatine derxistin dike. Partiya nijadperest û Serokê wê Devlet Bahçelî ligel ku nexweşiya şewba berazan 200 tirk kuştiye jî dibêje ev nexweşî nîn e. Artêş jî diçe bi destê çeteyan xristiyanan dide kuştin da ku AKP'ê ji desthilatiyê daxe. Li ser vê gotina dawî vê îroniyê dike: "Gelo AKP ji bo şer çima vana neşîne Afganistanê?" LONDON



## Mîsyona Tirkiyeyê diyar dibe

Wezîra Karên Derve ya Amerîkayê Hillary Clinton bang kir ku Tirkiye leşkeran bişîne Afganistanê. Clîntonê destnîşan kir ku li Afganistanê ne şerê oliye. Li Afganistanê herî zêde misilman tên kuştin û ji ber vê jî divê ligel Tirkiyeyê welatên din ên misilman ji bo şerê Afganistanê leşker bişînin. Daxuyaniya Clîntonê piştî aşkerakirina stratejiya şer a Serokdewletê Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê (DYA) hat dayîn. Tê zanîn ku di serê vê hefteyê de jî Serokwezîrê Tirkiyeyê Recep Tayip Erdogan diçe serdana Washingtonê.

Gelek derdor ji bo şerê Afganistanê şandin û neşandina leşkeran mîsyona hevdîtina nav Obama û Erdogan jî diyar bike.

Clîntonê jî di banga xwe de bal kişandiye ser daxuyaniya Obama ya li ser Afganistanê. Tê diyarkirin ku li Afganistanê rewşeke xeter heye. Di şer de pirtir misilmanên sivîl dibin qurban û DYA dixwaze pêşî li vê bigire û mîsyona xwe tîne cih. Ji hemû welatên cîhanê jî xwest ku li Afganistanê wek DYA'yê tevbigerin. LONDON

## Li Gîneyê ceribandina derbeyê

Li welatê Gîneyê ya bakurojavayê Afrîkayê Musa Dadis Camara ku di serê hikûmeta leşkerî de ye ji sûîqestekê xelas bû.

Dema ku Camara hikûmet girt bin destê xwe, di artêşê de albayeke nenaskirî bû.

Hat aşkerakirin ku alîkarekî leşkerî yê Musa Camara ev êrîş pêk aniye. Wezîrê Ragihandinê Albay Îdrisa Şerif diyar kir ku ev êrîş ji aliyê alîkarê Camara Diakite ve hatiye kirin.

Senegalê, ji bo dermankirina Camara heyetekek bijîşk şand Gîneyê. Li gorî weşana malperekê Camara niha li biryargeha paytextê tê dermankirin.

Li welat tê gotin ku di nav cûntaya leşkerî de nêrînên cûda gelek zêde bûne.

Wezîrê Ragihandinê Îdrisa Şerif derbirî ku ji bo birîna Camara çûyîna nexweşxaneyê ne pêwîst e. Albay Şerif wiha axivî: "Ez tenê dikarim bêjim ku Serokomar baş e û piştî nîvro bi fermandaran re civiyaye ev rewşa nexweş nirxandine.

Camara, di kanûna 2008'an de bi derbeyekê hikûmet destese kiribû û bibû Serokomar.

Camara piştî darbeyê anîbû ziman ku dê demokrasî ji binî ve bê avakirin. Lê ji rewşa wî ya dawîn wiha tê xuyankirin ku dilê wî tune ye hikûmetê berde. CONAKRY



## 'Israra şer dê Afganistanê bike Vîetnama duyemîn'

Sefîrê Îranê yê Parîsê Seyîd Mehdî Mîrabutalebî diyar kir ku Afganistan ji bo Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê (DYA) dibe Vîetnama duyemîn.

Mirabutalebî piştî ku Serokdewletê DYA'yê Barack Obama stratejiya Afganistanê ya şer aşkera kir daxuyanî da televîzyonek Fransayê. Di daxuyaniyê de da zanîn ku armanca DYA'yê ya li herêmê kontrola çavkaniyên xwezahî ye. Lê dixuye ku ev daxwaz DYA'yê li Afganistanê têk dibe. Hat gotin ku di şer de israr hebe dê Afganistan ji bo DYA'yê bibe Vîetnama duyem.

Li ser aşkerakirina stratejiya Obama ya Afganistanê pirs ji Mîrabutalebî hat kirin. Di bersivê de wiha got: "Çima ewqas hêzên biyanî li Afganistanê heye? El Qaîde kê damezirand? Talîban kê damezirand? DYA'yê ev damezirandin. Ji bo ku li Afganistanê bimîne ev hincet in. Ez difikirin ku dê Afganistan ji bo DYA'yê bibe Vîetnameke din."

Mîrabutalebî endamên esasî yên Konseya Ewlehiya Neteweyên Yekbûyî jî rexne kir. Ev çil sal e çekên wan ên nukleerî hene û divê bên îmhakirin. Em dizanin uranyumê dewlemend bikin. Hilberîna sotemeniya nukleerî pêk tînin. Em karin bazirganiya vê bikin û bifiroşin welatekî din. Cîhan ne tenê 4-5 welatên enda ên Konseya Ewlehiyê ne. PARÎS

## 3 jê wezîr 19 kes hatin kuştin

Li paytexta Somaliyê Mogdişuyê di torenekê de teqînek pêk hat û di encamê de sê wezîr jî tê de herî kêm 19 kes birîndar bûn.

Piştî teqînê li cihê bûyerê aloziyeke mezin çêbû.

Hat diyarkirin ku êrîş, çalakvaneke întiharê ku xwe xistiye şeklê jinan pêk aniye.

Wezîrê Enformasyonê yê Somaliyê Dahir Mohamud Gelle, diyar kir ku çalakvan kinc û sola jinan li xwe kiriye û serê xwe jî girtiye. Gelle bûyer wekî felaketeke neteweyî nirxand.

Heta niha tu kes li êrîşê xwedî derneket. Hin şahidên bûyerê dibêjin ku wan piştî bûyerê gelek cesed dîtine. Wan li eywanê 7 cesed dîtine.

Torena mezûnbûna 3 xwendekarên zanîngehê, bi beşdarbûna bi sedan kesî li oteleke Mogadişuyê dihat lidarxistin. Netewên Yekbûyî (NY) jî ji bo têkoşîna li dijî berxwedana komên islamî piştgiriyê dide hikûmeta Somaliyê. Lê hikûmet tenê di herêmeke biçûk de desthilatdar e.

**3 wezîr mirin**

Li gorî agahiyên ku hatine bidestxistin, Wezîrê Tenduristiyê Kamar Aden Alî, Wezîrê Perwerdehiyê Ahmed Abdulahî Wayeel û Wezîrê Perwerdehiya Bilind Îbrahim Hassan Addow di êrîşê de mirin. Di nav kesên mirî de rojnamevan jî hene. Hêza Aştiyê ya Yekitiya Afrîkayê (AMISOM) tenê kîlometreyeke dûrî otela ku teqîn lê qewimiye ye. Hat îdiakirin ku di dema teqînê de hemû parêzvanên wezîran li derve bûne û tedbîrên ewlehiyê baş nehatine girtin.

Berdevkê AMISOM'ê Wafula Wamunyunî destnîşan kir ku ev êrîş ji bo hikûmetê bitirsînin û şantajê bikin kirine. Li Somaliyê, ji sala 1991'an û vir de tu hikûmeteke navendî nehate avakirin. MOGADÎŞÛ



## Li Iraqê rêjeya şîdetê kêm bû

Li bajarê Tîkrîta Iraqê di encama teqîneke întiharî de bi kêmanî 5 kes hatin kuştin. Hat aşkerakirin ku di nav kesên hatin kuştin de şefê polîs ê bajêr jî heye.

Polîs li ser mijarê daxuyanî da. Diyar kir ku berxwedêran Şefê polîs Ehmed El Fahal hedef girtine û teqîn pêk anîn û ligel şef bi kêmanî sê parazvanên şef jî hatin kuştin.

Her wiha li Mûsilê jî xwepêşandêran bi ser noxteyeke kontrolê de girtin û du leşkerên Iraqê kuştin. Li bakurê Bexdayê jî madeyên teqînê yên di bin fêkiyên li wesayîtê barkirî hatin teqandin, kesek hat kuştin û 6 kes jî birîndar bûn. Li ser rewşa Iraqê ya bi giştî jî agahî hat dayîn. Di agahiyê de hat diyarkirin ku ji sala 2003'yan û şûn ve meha mijdara borî wek meha ku herî kêm sivîl hatine kuştin, bû. BEXDA

## Meşa bi meşale pêk anîn



**JINÊN** Êlihî, bi armanca şert û mercên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar bikin meşek bi meşale pêk anîn û pankarta "Em dê cîhanê li TC'ê tarî bikin" vekir. Bi sedan jin, li taxa Yavuzselîmê li hev civiyan û meşek bi meşale pêk anîn. Jinên ku li ber Goristana Yavuzselîm civiyan, heta kolana Cizîrê meşiyan. Jinan pankartek mezin û reş a "Em dê cîhanê li TC'ê tarî bikin" vekirin û posterên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û alên Konfederalizma Demokratîk rakirin. Jinan di meşa ku nêzî saetekê dom kir de bê navber dirûşmeyên "Bijî Serok Apo", "Bi can bi xwîn em bi terene ey Serok", "Bê Serok jiyan nabe", "PKK gel e, gel li vir e", "Şehît namirin", "Deşta Êlihê, hêlîna Apoyiyan", "Ocalan Ocalan", "Li çiyê û deştê Apoyî li her derê", "Bi can bi xwîn em bi terene ey Serok" berz kirin. Şaredarê Êlihê Nejdet Atalay, Serokê DTP'ê ya Êlihê Ahmet Sormaz û endamên Meclîsa Şaredariyê jî piştgirî dan meşa jinan.

Li aliyê din li taxên Baglar, Hîlal, Îluh, 19 Mayis, Kismet, Îpragaz jî bi heman armancê çalakî pêk hatin. Di çalakiyan de ciwanên ku li hev kom bûn agir pêxistin. ÊLIH

# 'Hesasiyeta kurdan fêm bikin'

**Endam û nûnerên saziyên jinan ên Enqereyê têkildarî şert û mercên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan nerazîbûnên xwe anîn ziman û xwestin hesasiyetên kurdan li ber çavan bêne girtin**

Li Enqereyê nûner û endamên saziyên jin şert û mercên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ên Îmralî rexne kir û diyar kirin ku bi tecrîda li ser Ocalan, zorê li sebra kurdan dikin. Jinan, bangî her kesî kir û xwestin hesasiyeta kurdan fêm bikin.

Ji tevgêra Femînîstan Aysel Ergun, xwest pêvajoya hewldana çareseriyê bi awayekî giştî bê nirxandin û diyar kir ku di vê hewldanê de aştiyek bi rûmet nayê xwestin. Ergun, da zanîn ku hikûmet li gorî xwe aştî û çareseriyê dixwaze û wiha got: "Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan girêk û demara kurdan a herî hasas e. Ji ber ku li gorî xwe dixwazin çareseriyê pêk bînin niha xuya dibe ku dê encameke çawa derkeve holê." Ergun, helwesta medyayê jî rexne kir û anî zimam ku bi awayekî pir şaş û ji rastiyê dûr raya giştî agahdar dike û ev yek dibe sedema aloziyan. Ergun, axaftina xwe wiha dom kir: "Ji ber ku aştiyek rûmet naxwazin şert û mercên Ocalan biguherin. Kengî mirovan daxwazên xwe anîn ziman wê demê li Îzmîrê alozî derxistin. Serî li dek û dolaban dan. Rasterast gotin feraseta me ya aştiyê alozî ye û gef li kurdan xwarin."

Ergun, bal şikand ser şert û mercên Ocalan û wiha dom kir: "Kesekî ku gel ji wî re dibêje 'Rêberê me' divê teqez şert û mercên wî bêne başkirin. Li aliyekî dibêjin gavên demokrasî û çareseriyê, li aliyê din tecrîda li ser Ocalan girantir dikin. Bi vî rengî çareserî pêk nayê. Ji ber vê yekê gelê kurd derketiye kolanan. Derketina gelê kurd a kolanan pir asayî ye."

**'Em li dijî tecrîdê ne'**

Endama Platforma Çepgir a Azadiyê Şukriye Ercan jî ji ber ku hesasiyetên kurdan nayê dîtin rexneyên xwe li hikûmetê kir û diyar kir ku li ser Ocalan tecrîdeke giran tê meşandin. Ercan, anî ziman ku kesên ji aştiyê ditirsên, pêvajoya aştiyê sabote dikin. Ercan, destnîşan kir ku divê derdorên li Tirkiyeyê têkoşînê didin gelekî hişyar bin û bal kişande ser nesamîmiyeta AKP'ê û wiha got: "Em li dijî tecrîda li ser Ocalan in. Gelê kurd di vê mijarê de mafdar e. Ocalan ji bo gelê kurd gelek watedar û mezin e. Belkî hinek bibêjin serokê 'rêxistineke terorê ye' lê Ocalan ji bo gelê kurd gelek tiştên mezin kirine û hêj dike. Di vê mijarê de divê hesasiyetên gelê kurd bi awayekî hestiyarî bên dîtin. Em tecrîda li ser Ocalan rast nabînin."

**Pêvajoya qedandinê**

Cîgira Giştî ya SDP'ê Yeşîm Ergul jî, diyar kir ku navê hewldanên çareseriyê ku wekî "Projeya neteweyî" hatibû binavkirin, niha jî bûye "Projeya qedandinê. Navê hewldananên vekirinê, qedandin, ên demokrasiyê jî cih da binçavkirin, pêkutî û mêtîngeriyê." Ergul, anî ziman ku li gel nesamîmiyeta hikûmetê jî lazim e piştgirî ji bo teşebûsên sekinandina xwînê bên dayîn û wiha got: "Lê di asta niha de xwepêşandanên gelê kurd ên mafdar tên astengkirin, nêzîkatiyên muxalefetê yên faşîzan jî ji aliyê dewletê vê rewa tên dîtin. Her wiha gel jî teşwîqî faşîstî û şoveniyê dikin. Ev yek jî diyar dike ku pêvajoya çareseriyê vegeriya pêvajoya qedandinê. Girantirkirina rewşa birêz Abdullah Ocalan jî nîşaniya vê yekê ye. Ger dixwazin hewldanan bikin û zilma bi salan a li gelê kurd bûye bibînin, diviya rewşa Birêz Ocalan ku wekî rêberê xwe qebûl kiriye, bihata baştirkirin, lê wekî ew jî dibêje di asta bêhnnestandinê de girtina wî, rast nîn e. Li hemberî xwepêşandanên mafdar jî girtin û hewldanên bêdengkirinê rast nîn in. Heta vîna gel neyê nasîn û rêberê wan neyê nasîn, pêvajoya aştî û demokrasiyê dê pêk neyê."

**'Sebra gelê kurd didin zorê'**

Seroka Şaxa Hejmara 2'yan a Tum Bel-Senê Sati Buruncu Çali jî, da zanîn ku pirgirêka kurd di astek krîtîk de ye û hişyariya ger pirgirêk neyê çareserkirin dê neteweperestî bilindtir bibe, kir. Çali, destnîşan kir ku di pêvajoya hewldanan nesamîmîbûnên Hikûmeta AKP'ê derxistiye holê, bi taybetî jî herî dawî teşebûsên lîncê ji aliyê Serokwezîr vê hatibû parastin û wiha axivî: "Pêkanînên nebaş ên li hemberî Ocalan ji bo sebra kurdan bixin zorê ye. Tiştên ku ji hewldanên demokratîk fêm dikin jî di bin navê nîqaşên çêker de fetisandina têkoşîna azadiya gelê kurd e." ENQERE (DÎHA)

## Tu carî 'Çala mirinê' qebûl nakin

**GELÊ** li Mexmûrê, bi armanca şermezarkirina şert û mercên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ku Ocalan wekî "Çala mirinê" bi nav kiribû, ketin nav çalakiyan. Jinên li Mexmûrê daxuyanî dan û tecrîd şermezar kirin.

Meclîsa Îştar a Jinan li Wargeha Penaberan a Mexmûrê, der barê rewşa Ocalan de, li ber avahiya Weqfa Jinan a Mexmûrê daxuyaniyek dan çapemeniyê. Jinan pankartên "Hûn nikarin roja me di 6 metrekareyan de bigirin", "Tenduristiya Rêber APO, tenduristiya me ye" û posterên Abdullah Ocalan û alên KCK'ê û KJB'ê bilind kirin. Jinan bênavber dirûşmên dilsoziyê berz kirin.

Li ser navê jinan Endama Kordînasyona Meclîsa Îştar a Jinan, Selamet Erdogan, daxuyand ku tecrît û îzolasyona giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tê meşandin, bi tundî şermezar dikin û wiha got: "Rêberê me rêber Apo, ev 11 sal in li Îmraliyê di nava şert û mercên îzolasyon û tecrîtê de dijî. Îşkenceyeke giran li ser Rêberê me tê meşandin. Bi guhertina cihê Rêber Apo şertên jiyana wî girantir bûne û guhertina cihê xwe wekî darbeya 17'ê mijdarê û şertên cihê jiyana xwe jî wekî 'Çala mirinê" binav kir. Em weke jinên Mexmûrê tu caran vê rewşê qebûl nakin. Ev yek komploya tasfiyekirina gelê kurd e. Em vê yekê bi tundî rexne û şermezar dikin. Hêzên desthilatdar û dewleta tirk dixwaze rondikên çavên dayikan birjînin û xwîna heta niha dirije, bidomîne. Em weke jinên êşkişandî vê rewşê qebûl nakin."

**'Bila CPT lêkolînekê bike'**

Erdogan, anî ziman ku CPT qaşo ji bo başkirina cihê Abdullah Ocalan ew ferzî dewletê kiribû û dewletê jî dest bi çêkirina cihê nû yê Îmraliyê kiribû û wiha axivî: "Ji ber vê yekê berpirsiyarê vê rewşê CPT ye. Em bangî CPT'ê dikin, bila ji bo sererastkirina tenduristiya Rêberê me bikeve nava hewldanan û biçe li cihê nû yê Îmraliyê lêkolînan bike." Her wiha Erdogan, bangî hemû jinan kir ji bo li dijî girankirina îşkence û tecrîda li Îmraliyê bikevin nava çalakî û serhildanan û xwestin her kes rewşa Ocalan bixe rojeva xwe. MEXMÛR

## Greva birçîbûnê ya bêdem

**GIRTIYÊN** PKK'ê yên jin, li Girtîgeha Karataş û Gebzeyê bi armanca balê bikşînin ser şert û mercên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dest bi greva birçîbûnê ya bêdem kirin.

22 girtiyên jin ên PKK'î yên li Girtîgeha Karataşê dimînin, bi riya malbatên xwe diyar kirin ku wan bi armanca şert û mercên Ocalan şermezar bikin di 30'ê mijdarê de dest bi greva birçîbûnê kirine. Malbatan anî ziman ku 3 jinan bi awayekî bêdem û 19 jinan jî bi awayekî dorveger dest bi greva birçîbûnê kirine. 19 jinên ku bi dorveger dest bi grevê kirine, dan zanîn ku ger ku şert û mercên Ocalan baş nebe, ew jî dê dest bi greva bêdem bikin. Girtiyan, bi bîr xistin ku wan ji Serokomar, Serokwezîr û Wezîrê Dadê re faks şandine û xwestin mercên Ocalan bêne başkirin.

Li Gebzeyê jî greva birçîbûnê

Girtiyên jin ên PKK'î yên li Girtîgeha Tîpa M a Gebzeyê bi armanca şermezarkirina şert û mercên Abdullah Ocalan dest bi grava birçîbûnê ya bêdem kirin. Di nameyê de wiha hate gotin: "Birêz Abdullah Ocalan sewqî Girtîgeha Tîpa F a Îmraliyê kirin şertên wî hêj girantir kirine. Polîtîkayên dewletê yên çareseriyê bi polîtîkayên li Îmraliyê bi kar tînin derket holê. Hikûmet bi van polîtîkayên li ser birêz Ocalan dixwaze gelê kurd jî bê bêhn bihêle û di binê bîrekê de îmha bike. Em girtiyên PKK'î li hemberî polîtîkayên qirêj ên li hemberî Serokatiya me bêdeng namînin. Bi vê armacê em dest bi greva birçîbûnê ya bêdem dikin." KOCAELÎ / EDENE




## Jina winda bûbû mirî hate dîtin

Li navçeya Gexteyê ya Semsûrê ciwana bi navê Medînê Memî ya 16 salî ku hate angaştin winda bûye, li bexçeyê mala xwe bi awayekî definkirî hete dîtin. Jina tê texmînkirin hatiye kuştin, ji cihê lê hatiye veşartin hate derxistin, dayik û bavê wê jî hatin binçavkirin.

Li Gexteyê, kesek li polîsan geriya û der barê angaşta Medîne Memî winda bûye de got "Medîne Memî, bi biryara meclîsa malbatê hatiye qetilkirin û ew di bin pînika bexçeyê mala wê de veşartine". Li ser îxbarê polîsan li mala li ser kolana Tenduristiyê de ya li taxa Hurriyetê lêgerîn dan destpêkirin û gihîştin cesedê Memî.

Hate zanîn ku jina ciwan beriya 2 mehan bi hinceta kalê wê Fethî Memî, bi hinceta bi kurikan re diaxive lêdixe û şîdetê lê dike serî li polîsan daye, der barê Fethî Memî de jî lêpirsîn hatiye vekirin. Her wiha tê gotin ku keça ciwan bi hinceta bi kurikan re geriya ye hatiye qetilkirin. Polîsan der barê buyerê de dayika Medîne Memî, Îmmîhan, bavê wê Ayhan û kalê wê Fethî Memî binçav kirine. 3 gumanbar ji bo lêpirsînê birin Midûriyeta Polîsan a Gexteyê. Lêpirsîna der barê bûyerê de jî dom dike. SEMSÛR



# 20 roj cezayê hucreyê dan

Rewşa tenduristiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan gelekî xirab e, bi ser de jî cezayê hucreyê yê 20 rojan lê hat birîn. Ocalan got, bahaneya vî cezayî jî hevokeke di axaftineke wî de ye. Der barê mijarê de Ocalan wiha peyivî: "Ji nû ve cezayê hucreyê yê 20 rojan li min birîn. Vî cezayî disipêrin axaftineke min. Tevahiya axaftinê negirtine. Ez tesbîtekê dikim, ew ji nava vê tesbîtê bi tenê hevokekê dineqinin û dibêjin te talîmat daye. Min gotibû 'Eger parlaman çareseriyê bi pêş mexe, di biharê de şerekî mezin dê biqewime. Kurd wê xwe biparêzin'. Va ye hûn dibînin, tiştên diqewimin li holê ne. Zivistan û bihara vê meseleyê nîn e. Ya ez dibêjim rast jî nanirxînin. Ev hevok kêm e. Ez baş dizanim min çi gotibû.' Ocalan da zanîn ku ew li ber biryarê rabûye û serî li Dadgeriya Girtîgeh û Ceza daye û gotiye, wê ferman nedaye, tesbît kiriye.

**'Kurd ji bo xwe şer dikin'**

Ocalan anî ziman ku ne di rewşekê de ye ku fermanê bide mirovan û wiha dewam kir: "Li vir ez ne di rewşekê de me ku fermanê bidim mirovan. Jixwe kurd ji bo xwe şer dikin. Eger di salên 2000'î de bûya, min dikarî bêjim, ji bo min şer dikin. Lê di sala 2010'an de ji bo xwe şer dikin. PKK jî eger şer bike dê ji bo xwe şer bike. Kurd bo hebûn û azadiya xwe şer dikin. Loma ez ne dikarim ji wan re bêjim bikin, ne jî nekin. Ew ê biryarê bidin ka ew ê çi bikin û çi nekin. Divê nepên ku ez li vir bi awayekî pratîk rêberiyê bikim."

## 'Li gotinên xwe xwedî derdikevim'

**RÊBERÊ** Gelê Kurd Abdullah Ocalan li ser gotinên xwe yên bûne sedema cezalêbirînê, wiha got: "Ya rastî min nexşeya rê ji bo rêvekirina li çareseriyê amade kiribû. Min di nexşerê de gotibû, eger Parlamento necive û der barê kurdan de biryarê nede û nekeve nava meseleyê, ev pirsgirêk dê çareser nebe. Eger parlamento tevlî vê meseleyê nebe dê çi bike, çawa çareser bike? Ez van gotinên xwe dubare dikim û xwedî li wan derdikevim."

**Divê bi cidiyet nêzîk bibin**

Ocalan her wiha anî ziman ku divê hatina Tirkiyeyê ya komên aştiyê weke jidilî û cidiyeta aliyê kurd bê qebûlkirin.

**'Hewceyî bi komên nû nîn e'**

Rêberê KCK'ê Abdullah Ocalan bersiv da Wezîrê Karê Hundir Başîr Atalayê ku timî behsa komên aştiyê yên nû û Mexmûrê dike: "Niha Atalay behsa komên nû yên aştiyê dike. Na, piştî vê saetê êdî hewcedarî bi komên nû nîn e. Wezîrê Karê Hundir dibêje; 'Em ê li Xabûrê gundekî ava bikin, yên bên wê li wir bimînin, ji wir jî wê biçe mala xwe!' Yek kes jî nayê wir. Em ji bo bawerî û jidilbûna xwe ya bi aştî û jiyana bi hev re, bi azadî û çareseriya demokratîk nîşan bidin, me bang li komên aştiyê kir. Me ev jidilbûn û samimiyet nîşan da. Ez bawer nakim ku piştî vê, komên nû yên aştiyê bên. Ez yeqîn nakim ku ji gel û Mexmûrê jî kesên bi vî rengî bên hebin. Hesasiyetên wan jî hene. Demên berê jî komên aştiyê ji bo jidilbûn û cidiyeta kurdan nîşan bidin hatibûn Tirkiyeyê. Ez bawer dikim ku ev têra xwe hat dîtin. Ez dibêjim; di warê çareseriyê de ji bo peşeroja Tirkiyeyê em ji jiyana bi hev re û biratiyê re hene, lê ev jî bi qebûlkirina hebûna kurdan û parastina rûmeta wan mimkûn dibe. Ez vê jî hem ji dewletê, hem ji PKK'ê, hem ji DTP'ê û hem jî ji tevahiya kurdan re dibêjim."

**'Kurd ji bo rûmeta xwe dijîn'**

Ocalan bi bîr xist ku wî nexşerê bi armanca siyaseta xetimiye rê lê veke amade kiriye û wiha got: "Piştî vê qonaxê kurd hebûn û rûmeta xwe radestî kesî nakin. Ez bibêjim jî radest nakin. Ji niha û pê ve dê ji bo hebûn û rûmeta xwe bijîn. Min di nexşerê ya xwe de gotibû; ya hûn dikin qirkirin e; qirkirina çandî, qirkirina siyasî, qirkirina civakî, qirkirina aborî ye. Eger hûn hebûna kurdan nas nekin, ji azadiya wan re bi hurmet nebin, hûn ê çawa bi kurdan li hev bên?"

### Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di hevdîtina xwe de got:

# Kurd rûmeta xwe teslîm nakin



Ocalan diyar kir ku kurd dê ber xwe bidin û got: "Piştî vê qonaxê kurd dê hebûn û rûmeta xwe teslîmî kesî nekin. Ocalan AKP, CHP û MHP şibandin partiyên israîlî û got: "MHP'ê dişibînim Lîkudê, CHP mîna Partiya Karker a Israîlê ye û AKP jî Qadîma ye"

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan roja çarşemê hevdîtina bi parêzerên xwe re pêk anî û got ku, şertên girankirî yên sîstema işkenceyê ya Îmraliyê dewam dikin. Ocalan di hevdîtina hefteya derbasbûyî de sewqkirina wî ya li Girtîgeha Tîpa F, wekî darbeya 17'ê mijdarê bi nav kiribû. Ocalan cara yekemîn bi awayekî berfireh behsa tenduristiya xwe kiribû û hucreya 6 metrekareyî jî wekî 'çala mirinê' nîşan dabû.

Di hevdîtina vê hefteyê de jî diyar bû ku, digel hemû hewldanan, di şertên li Îmraliyê de tu tişt neguheriye.

Ocalan şertên lê dijî wiha anîn ziman: "Wekî di bin bîrekê de me. Ji sedî 25'ê hewaya paqij digirim. Li vir xew nîn e. Nikarim razêm. Çavên xwe digirim û vedikim. Dema dengek tê û derî vedibe jî, hişyar dibim. Di van şertan de, rewşa min ya tenduristiyê jî û psîkolojîk jî destûr nade tiştên zêde bikim."

Ocalan bi bîr xist ku cihê wî yê berê ji yê niha baştir bû û wiha got: "Li odeyê wekî berê hê 3 pirtûk, kovarek û rojnameyek dihêlin. Ji bo tenduristiya xwe divê karibim hewaya paqij bigirim. Dema radizêm nikarim hewa bigirim. Qirika min ziwa dibe. Hema hema qet ranazêm. Dîwarên hewşê pir bilind in. Li vir nikarim hewaya paqij bigirim. Hewa di jor re derbas dibe. Li vir wekî di bin bîrekê de bim."

Ocalan hefteya derbasbûyî jî gotibû ku, ji ber nikare baş hewayê bigire, ew hîs dike ku hucreyên mêjiyê wî hêdî hêdî dimirin. Ocalan anîbû ziman ku, ev yek jî bandor li hemû fonksiyonên bedena wî dikin û wekî nîvmirî dijî.

**'Bi tasfiyekirinê pêvajo nadome'**

Rêberê KCK'ê Abdullah Ocalan got, di van şert û mercan de ku bi zor bêhnê dide û distîne, divê ji wî hêviya tiştekî zêde neyê kirin û wiha bang li Erdogan û Gul kir: "Ez bang li Erdogan û li Gul jî dikim. Ev 7 sal in em li benda wan in. Lê ji niha û şûn ve em nikarin li benda wan bin. Nikarin bi van planên tesfiyekirinê jî vê pêvajoyê dewam bikin. Eger wisa bikin, aqûbeta wan jî wê bibe weke ya Erbekan û Ozal, ew ê werin tesfiyekirin. Ez tesfiyekirina Ozal di vê çarçoveyê de dinirxînim, hinekî nêzî çareseriyê û serxwebûnê sekinî, ew tesfiye kirin. Erbekan jî hinekî demokratê îslama nerm bû, wî jî hewl da hin tiştan bike, ew jî ji desthilatdariyê anîn xwarê. Çiller anîn. Tê zanîn, Çiller sîxura CIA'yê bû. Piştre tiştên xeternak qewimîn. Dibêjin 17 hezar kuştinên kiryarên wan nediyar qewimîn. Ecevît jî dixwest tiştinan bike, Bahçelî jî ew asteng kir. Xwe da paş û hikûmet ji desthilatdariyê xist. Paşê jî, pirsgirêkên Ecevît jî ne welê weke tê gotin bûn. Pirsgirêkên wî yên tenduristiyê çêkirin. Eger AKP hewl bide vê pêvajoyê ber bi tesfiyekirinê ve bibe, beriya biharê di nava du, sê mehan de ew ê bi xwe tesfiye bibe û biçe. Ez ji kurdan re jî dibêjim; divê vê pêvajoya tesfiyekirinê baş fêm bikin û ciddî nêzîk bibin."

**'Rewşa hikûmetê dişibe Sedam'**

Rêberê KCK'ê Abdullah Ocalan, hikûmeta AKP'ê ya hesabê tesfiyeyê dike û CHP û MHP'ê ku di siyaseta bêçaresiyê de bûne hevpar, rexne kirin. Ocalan siyaseta li ser navê AKP'ê tê meşandin wiha anî ziman: "Hikûmet dibêje, ez çi bidim we, pê razî bin. Ez ê bi xwe, bêîradeya xwe, bi awayekî yekalî çareser bikim. A rast, ev ne siyaseta hikûmetê, ev siyaseta îngilîzan e. Jixwe hêza hikûmetê jî nîn e bi serê xwe van bi cih bîne. Li rewşa min ya li vir binêrin. Ev girtîgeh, CPT û Ewropa, yanî Îngilîstan û Amerîkayê xwest. Tirkiye jî dê pêwistiyên wê bi cih bîne. Niha jî Tirkiye dibêje qey ew bi hêz e û her kes piştgirî dide wê!. Îran, Iraq, Bakurê wê û Sûriye jî piştgirî didin. Ez jî dibêjim, bawerî Sûriye, Îranê, Iraqê û rêveberiya li bakurê wê nekin. Berjewendiyên Amerîka û Îngilistanê hene. A rast rewşa niha ya hikûmetê dişibe rewşa Sedam".

**'Jenosîdê hêjayî kurdan dibînin'**

Ocalan bal kişand ser dîroka siyaseta tirk û Îttîhatî Terakî û anî ziman ku AKP, CHP û MHP jî, encamên kevneşopiya heman siyasetê ne. Ocalan bi bîr xist ku xwediyê gotina 'Nasnameya Jorîn', Îttîhat Terrakiye û got: 'Ez ji bo MHP'ê dibêjim, Partiya Tirk a Siyonîst ya Anatoliyê. CHP dewama Îttîhat Terrakî ye. Lê belê, MHP jî, partiyeke ku, ji aliyê Îttîhat Terrakî ve hatiye avakirin e.'

Ocalan gotinên xwe yên di vê mijarê de wiha dewam kir: "Ji vê aliyê, CHP jî û MHP jî dewama van polîtîkayan e. Tu eleqeya van, bi tirkîtî, demokratiya tirk, welatparêziya tirk û nijatperestiya tirk re nîn e. Ew hewl didin hikûmet û dewletê li gorî berjewendiyên xwe teslîm bigirin. Ew dixwazin kurd û tirkan bînin hemberî hev. Ev jî bilî asîmîlasyon û jenosîdê, tiştekî din hêjayî kurdan nabînin."

**'Dişibin partiyên Israîlê'**

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan anî ziman ku ji bilî CHP û MHP'ê kurd dikarin bi derdorên din re biaxivin û li hev bikin û AKP, CHP û MHP jî şibandin wekî partiyên li Israîlê û wiha dewam kir: "Ez, MHP'ê dişibînim Lîkûda li Israîlê. CHP'ê dişibînim Partiya Karker a Israîlê. AKP'ê jî dişibînim Qadîmayê. AKP beriya Qadîma hate avakirin. Wekî min berê jî gotibû, tiştên wiha berê li Tirkiyeyê tên ceribandin. CHP nêzî siyaseta îngilîzan e. Siyaseta wan dimeşîne. Nijatperestiya MHP'ê jî, wekî siyonîzma Israîlê ye. Wateya nijatperestiya her duyan jî, siyonîstî ye. Wekî şexs Bahçelî û Baykal ew qas ne girîng in. Ya girîng siyaseta ku ew temsîl dikin û rolên wan in.

MHP û CHP ne nijatperestên tirk in, di rastiyê de ew siyonîst in, siyonîzma tirk êrîşkar û faşîst e".

**'Kurd plana tasfiyeyê qebûl nakin'**


Ocalan ji bo hewldana siyaseta kurdan fêrî plana tesfiyeyê bikin jî wiha got: "Erdogan, ji Baykal re dibêje; em ê bi rengekî hêdî hêdî daqurtandin vê pêvajoyê bimeşînin. Baykal jî di bersiva dide Erdogan de dibêje, "hûn dixwazin me fêrî vê yekê bikin' û mînakeke beqê da. Ez jî dixwazim bi riya wê mînaka beqê rawe bikim ka çawa nêzî kurdan dibin; dema hûn beqekê bavêjin binê beroşekê dê li wir avjeniya xwe bidomîne. Dema hêdî hêdî av germ dibe jî avjeniya xwe didomîne û fêrî vê yekê dibê. Dema av hîn bêhtir were germkirin êdî mikare xwe ji beroşê biavêje, ji ber ku hêza xweavêtinê di xwe de nabîne. Di encamê de çi dibe, bi kelîna avê re ew jî dikele. Rewşa kurdan jî dişibe vê yekê. Dixwazin kurdan fêrî tasfiyeyekê bikin. Bêguman kurd vê yekê qebûl nakin, mirov ne mîna beqê ye."

Ocalan wekî din got: 'Kurd dê nebin wekî ermeniyan û rûman. Hûn ê nikaribin wan jî vê axê derxin. Kurd dê li ser axa xwe bimînin û dev ji rûmet û azadiyên xwe bernedin."

STENBOL (ANF)

# Pirtûka Muzîka kurdî ya qesran

**Xebatên li ser çanda kurdî ya dewlemend û qedîm bi berhemên nû didome. Muzîka Serayê ya Kurdî ji bilî çanda dewlemend a dengbêjiyê di heman demê de aliyê muzîka kurdî ya gel jî radixe ber çavan**




Xebatên bêhempa yên li ser çand û hunera gelê kurd berdewam dikin. H. Mem, Zana Farqînî, Miraz Ronî û Şefîk Beyaz bi xebata xwe ya nû dewlemendiya muzîka kurdî raxistin ber çavan. Xebata bi navê Muzîka Serayê ya Kurdî wekî pirtûk hate çapkirin, li îngilîzî û tirkî jî hate wergerandin. Navê pirtûka wergera wê ya erebî jî hatiye kirin, ji aliyê Civaknas Îsmaîl Beşîkçî ve hate kirin.

Pirtûka nû bi zaravayên kurmancî û soranî yên kurdî hate çapkirin a bi navê 'Muzîka Serayê ya Kurdî' ji bilî çanda dewlemend a dengbêjiyê, di heman demê de aliyê muzîka kurdî ya gel jî radixe ber çavan. Muzîka hunerê ya kurdî ji hêla H. Mem, Zana Farqînî, Mîrza Ronî û Şefîk Beyaz ve yekem car bi berfirehî hate dahûrandin. Di pirtûkê de estrûman û meqamên muzîkê yên di pirtûka Ehmedê Xanî ya bi navê Mem û Zînê de cih digirtine hatine tespîtkirin û dahûrandin.

**Bi 4 zimanan hat çapkirin**

Pirtûka bi kurdî hate nivîsandin, li erebî, îngilîzî û tirkî jî hate wergerandin. Beşa bingehîn a xebatê li ser ji besteyên têkildarî meqamên kurdî yên di Mem û Zînê de hatine bikaranîn, hatiye avakirin. Di pirtûkê de aliyê muzîka kurdî ya remzî, hejmara meqaman, jiyandin û nejiyandina van û li ser vê bingehê li çar parçeyên kurd lê dijîn, xebat hatiye meşandin. Di pirtûkê de CD'yek ji 12 berhemên Muzîka Kurdî ya Serayê cih digirin jî hene.

**12 meqam hatin bestekirin**

Muzîsyen Behrûz Rezaî di çarçoveya xebatek berfireh de 12 meqamên heyîn cardin beste kirin. Meqamên hatine bestekirin wiha ne: Evîna Xanî, Dûrî, Dengî, Dîl, Rizgarî, Êşa Memê, Serkeftin, Şahî, Neviyê Baban, Bayê Eşqê û Newroz. Xebatkarê vê projeya berhemdar û zimanzanê kurdî, xwediyê ferhenga herî mezin a Kurdî-Tirkî Zana Farqînî diyar kir ku xebata wan xebatek kolektîf e û wiha got: "Aliyek xebatê teorîk e û aliyê din jî pratîkbûna muzîkê ye. Jixwe Ehmedê Xanî di Mem û Zînê de meqam, têgeh û enstrûmantalên muzîkê vedibêje. Me dîroka muzîka serayê ya kurdî girte dest. Navê pirtûkê jî birêz Îsmaîl Beşîkçî pêşniyar kir. Gelê kurd der barê dîrokê xwe de zêde xwedî agahî nîn e. Dewlemendiya muzîka kurdî nizane."

**Meqamên berê**

Farqînî bi bîr xist ku Ehmedê Xanî berhema xwe ya Mem û Zînê di 1695'an de amade kiriye û di xebatê de behsa meqamên kurdî tê kirin. Farqînî diyar kir ku meqamên berheman lêkolîn kirine û wiha got: "Me xwest em ji wan meqaman berhemên nû çêbikin. Me xwest em balê bikişînin ser dîroka kurdî. Me xwest em sarayên k urdan û Şeref Xan vebêjin. Her wiha me xwest em malbata Bedirxan û Qesra Birca Belek, saraya Îshak Paşa û sarayên din ên bûne bingeha muzîka hunerî ya kurdî vebêjin.

**Muzîka kurdî û tirkî**

Têkildarî mijarê Farqînî anî ziman ku li gorî otorîteyên muzîkê ji sedî 60'ê muzîka hunerê ya tirk ji muzîka hunerê ya kurdî pêk tê û wiha axivî: "Li gorî xebatên Prof. Dr. Mustafa Erduran Surat xebatên berfireh li ser repertûara muzîka hunerê kiriye. Li gorî lêkolînê ji sedî 40 repertûara TRT'ê ji meqamên kurdî pêk tê. Ji sedî 20 jî ji meqamên Mezopotamyayê pêk tê. Li gorî Surat di bingehê de muzîka hunerî tirkî ji muzîka hunerî ya kurdî pêk tê. Fanqînî diyar kir ku di muzîka kurdî de Malbata Mûsiliyan malbatek herî zêde derdikeve pêş e û wiha domand: "Îbrahîm Mehdî Mûsilî ku bi eslê xwe kurd e di dema Dewleta Abasiyan de teoriya muzîkê ya Pythagorasê ava kiriye. Mûsilî di bin hîmayeya Harun Reşîd de yekemîn dibistana muzîkê vekiriye. Dûre Îshaq Mûsilî ji bavê xwe ders girtiye û her wiha û her wiha piştre neviyê wî ev xebat meşandiye. Malbat demekê koçî Endûlîsa Îspanyayê bûye û gelek meqamên ni yên kurdî bi kar anîne." **STENBOL (DÎHA)**

# Ji bo lîstika '33 Gule' lêpirsîn



Lîstika şanoyê ya bi navê 'Dîroka bi şîn: 33 Gule' ku mijara wê qetilkirina 33 gundiyên navçeya Qerqeliya Wanê ye rastî lêpirsîna Serdozgeriya Komarê ya Enqereyê hat.

Lîstika şanoyê ya bi navê 'Dîroka bi şîn: 33 Gule' ji aliyê koma şanoyê ya DTP'a navçeya Altindaga Enqereyê ve tê lîstin. Lîstik yekem car li Enqereyê di 9'ê mijdarê de derketibû pêşberî şanohezan. Her wiha lîstik li Qerqeliyê ku cihê ku qetlîam pêk hatibû hat lîstin û rastî eleqeyeke mezin hat. Lîstik herî dawî li Amedê hat lîstin. Ji bo lîstikê ji aliyê Serdozgeriya Komarê ya Enqereyê lêpirsîn da destpêkirin. Buroya Lêpirsînê ya Sûcên Çapemeniyê di çarçoveya lêpirsînê de qeydên dîmenan lêkolîn dikin. Di lîstika ku zimanê wê bi kurdî û tirkî ye de qetlîama sala 1946'an ya ku li Qerqeliya Wanê pêk hatibû tê vegotin. 33 gundiyên bê sûc û bê guneh bi fermana Mustafa Muglali li Geliyê Sefo tên qetilkirin. Piştî demekê li Muglali doz tê vekirin û Muglali tê girtin. Ji bo wî cezayê îdamê tê dayîn lê Muglali di girtîgehê de dimire. Di sala 2004'an de bi biryareke sosret navê Mustafa Muglali li Qerqeliyê li qişlaya leşkeriyê kiribûn û ev ji aliyê kurdan ve rastî bertekên tund hatibû. Di heman demê de şaredariya Qerqeliyê jî biryar da ku abîdeya 33 guleyan çêbike. **ENQERE**




**Ehmedê Huseynî**

ehmedehuseyni@live.co.uk


## Rono 1996

Bi delkeyên nenas yên xwedawendên nenas û bi çeperên xewrevîna ji sosretan û bi nameyên kesk ên mirina kesk dorpêç dibim, dixeniqim û di keskên hêrsa te de diçurisim. Wek sirebayekî westiyayî li ser keviyên tûj ên berfê tarûmar dibim, letlet dikim, dikevim û nema radibim, bi tenhatiya xwe re; mîna ku bi porê te re be dileyizim, tenhatiya xwe delalî dikim, kedî dikim, mêşinî dikim, haş dikim, tenhatiya xwe di nav pencên tenhatiyê de bi tenê nahêlim û serbirên kenê xwe di qublenameyên penagehê de, yek li pey yekî, dibînim..

Wek pinpinîkeke sergerdan tu ber bi rakêşan û tîna dilê min ve dibezî û tu laşê min yê ji peyamên axê di nav stêrkên gerdeniya xwe de li derveyî demê dihêlî. Tu keskepencereyên penagehê di rûyê kevoka min de digirî û tu çavên bendemanê yên ji keskê şewitî bi kila peyvên xwe dirijînî.

Gulên min yên xeydok û serhişk hînî ronahiya destên te dibin, gerdûnê ji te re di bin çengê xwe de vedişêrim û bi dengê te yê ji çurisînê, diqîrim, bi dengê te bangî te dikim: De ji rojhilatê dilê min wek destên xatirxwestinê hil bibe û di rojavayê evîna min de weke kêlîka dawîn a dilbijînê bilerize, di damarên rojçêbûna min de bitevize, di reşgirêdana sirûdên dayika min de bigevize, banga min a ji guliyên berfê jî, bi xwe re, di şaneyên banga xwe de, velerizîne!

Ferhenga min li bin tava destên te germ dibû, tîpên min bi navê te sermest dibûn, bi sorgulan li ser hinarkên te afsaneya dilê min dinivîsandin.

Hawara min dihingivî dergehên şevistana êşa te û hêdî hêdî baskên min bi agirê dengê te dişewitîn.

Tovên xewna te li rêwiyan, li girtiyan, li sêwiyan, li mîrnişîniyan belav dikim û darbestên welatê xwe di hişê berfê de dikolim, miriyên ji dûmanê, hevalên ji dûmanê, giyanên ji dûmanê, cejnên ji dûmanê, diruşmeyên ji dûmanê, helbestên ji dûmanê, sînorên ji dûmanê, nasnameyên ji dûmanê, welatên ji dûmanê, li ber lingên qedera xwe û te radixînim û ji te re dibêjim: de fermo dînê xwe bikuje!

Fermo ji piyala bîra min, weke stiraneke nemir birije!

Fermo bi kêra xwe zimanê lêborîna min jêbike!

Fermo parzemîna gazinan rût bibîne û min jî di bîna daristana xwe de veşêre û biçîne!

Xwîna min ji nav destên xwe rizgar bike û bagerên min yên wendayî li min vegerîne.

Dergehan di rûyê min de negire, min şînê deryayê ji te re aniye.

Dilê xwe di rûyê min de negire min binefşa xewnê ji te re aniye.

Gewriya xwe di rûyê min de negire min gulgenima bîranînê ji te re aniye

Singa xwe di rûyê min de negire min baskê berbangê ji te re aniye

Laşê xwe di rûyê min de negire, min helbesteke germ û dilekî germ û welatekî germ ji te re aniye.

Ji gunehbariya te derdikevim..

Wek pêxemberekî sûcdar derbasî dojehên bendemana te dibim û di himbêza te de, bi tenê, di himbêza Nûristana xwe de, xwe hêjayî xwekuştin û xwe hêjayî nimêja poşmaniyê dibînim...

## 'Kulîlkên Xirabiyê' rekor şikand

Çapa pirtûka orjînal a helbestvanê fransiz Charles Baudelaire 'Les Fleurs du Mal' (Kulîlkên Xirabiyê) di mezatê de hat firotin. Pirtûk bi 775 hezar Euroyî hat firotin.


Charles Baudelaire yek ji helbestvanên navdar ê fransiz, yê sedsala 19'an e. Ji bo çapa orjînal a pirtûka wî ku wî bi xwe îmze jî kiribû mezateke li Otela Drouot a li Parîsa Fransayê hate li dar xistin. Di mezatê de 180 nameyên aîdê helbestvan, pirtûk û amûrên wî yên din hatin firotin. Ji van bi giştî 4 milyon û 50 hezar euro pere hat bi dest xistin. Pispor François Valleriauks da zanîn ku yekem pirtûka 'Kulîlkên Xirabiyê' bi ew qas pereyeke zêde hatiye firotin. di sala 1857'an de hatibû çapkirin, hebeke din a vê pirtûkê ku ew jî bi îmze bû 2 sal berê bi 560 hezar Euroyî hatibû firotin. Di mezatê de nameya Baudelaire ku ji bo şêwirmend Nacise Ancelle nivîsandibû jî bi 225 hezar Euroyî hate firotin. **LONDON**

www.arsivakurdi.org

# ZAROK

## Boyax





Hevalno, hûn dikarin xalan bigihînin hev? Em bibînin ka dê wêneyê çi derkeve.

## XAÇEPIRS

| A | B | C | Ç | D | E | Ê | F | G | H | I | Î | J | K | L | M |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 | 10 | 11 | 12 | 13 | 14 | 15 | 16 |
| N | O | P | R | Q | S | Ş | T | U | Û | V | W | X | Y | Z | |
| 17 | 18 | 19 | 20 | 21 | 22 | 23 | 24 | 25 | 26 | 27 | 28 | 29 | 30 | 31 | |

31 1 20 18 14 7 17 — 14 25 20 5 — 13 12 20 — 11 17


10 6 16 — 5 11 15 12 31 11 17

10 6 16 — 5 11 29 6 2 11 24 11 17



Hevalno, her reqemek dikeve şûna tîpekê. Gelo hûn dikarin tê derxin ka li jorê çi dinivîse?

Gelo hûn dikarin ji labîrentê riya rast bibînin?





## WÊNEFERHENG

Hevalên delal û jîr, gelo hûn dikarin li bin her wêneyekî navê wî binivîsin?



..................



..................



..................



..................



..................

Çaper
Klavye
Monîtor
Mişk
Qase

www.arsivakurdi.org

# Têkoşîna filistîniyan û Leyla Xalid

POLAT CAN

Filistîn heya destpêka sedsala 20'an di bin destê dewleta Osmaniyan de bû. Di heman demê de, xwesteka cihûyan a mezin hebû ku Filistînê ji xwe re bikin dewleteke cihû. Hemû hewldanên wan bi Sultan Abdulhamîd re vala derketin û nikaribûn ku Filistînê bi zêran bistînin. Piştî şoreşa ereban di dema şerê cîhanê yê yekemîn de û binketina dewleta osmaniyan, vêca artêşa îngilîz kete Filistînê. Bi arîkariya Îngilîzan, hemû cihûyên li welatên cîhanê berê xwe dane Filistînê û hatin tê de bi cih bûn. Gelek caran şer û pêvçûn di navbera cihû û erebên Filistînî de derketin. cihûyan xwe baş bi rêxistin kiribûn, ji wan re çek û arîkarî ji her derê cîhanê dihatin û roj bi roj xurtir dibûn. Di encamê de, Îngilîz xwe ji Filistînê vekşandin û cihê xwe dan cihûyan. Di sala 1947'an de, Wayzmen avabûna dewleta Îsraîlê ya cihûyan îlan kir.

Di vê navberê de gelek şerên mezin di navbera ereb û cihûyan de rûdan. Di encamê de her tim ereb bi bin diketin û cihû xurtir dibûn. Di encama zor û zextiyên cihûyan li ser ereban, bi sed hezaran erebên Filistînê cih û warê xwe berdan û li welatên derdorê bûn penaber. Piştî gelek salan filistîniyan jî xwe di nava tevgera rizgariya Filistînê de birêxsitin kirin û dest bi çalakiyên fedayî û şerê gerîla kirin.

Gelê Filistînî yên li gelek welatan penaber, xwe li van welatan rêxistinkirin, kampên leşkerî û perwerdeyê avakirin, mîlîtanên xwe ji bo şerê gerîla û çalakiyên fedayî amade dikirin. Bi sed hezaran filistîniyên li Suriyê, Lubnan, Urdun, Misir, Iraq û gelek welatên din, arîkariya manewî û madî ji birayên xwe yên erebên van dewletan digirtin. Tevgerên Filistînî yên cuda cuda, arîkarî ji hin welatên mezin jî digirtin. Hin dewletên ereban jî, peyman bi Îsraîl re mohr dikirin û xebatên filistîniyan di nava sînorên xwe de qedexe dikirin, ji bona vê yekê gelek şerên bixwîn di navbera rêxsitinên Filistînî û artêşên dewletên ereban de derketin, mînaka vê yekê jî şerê li Urdunê û li Lubnanê ne.

Qada rêxistinên filistîniyan a herî xurt erdê Lubnanê bûn, bi taybetî jî başurê Lubnanê. Di vê qadê de, bi dehan kampên filistîniyan ji bona perwerdeyê hatibûn avakirin. Gelek şikeftên binerd ên kûr û mezin hatibûn kolandin, piştî ku şervan li van deran perwerde didîtin berê xwe didan erdên Filistînê û di nava komên gerîla de şer dikirin.

Gelek caran dewletên ereban bi artêşên xwe yên fermî berê xwe dane eniya şer û li hemberî Îsraîlê bi mebesta rizgarkirina Filistînî şer dikirin. Di van şeran de artêşên Misir, Suriyê, Iraq û gelek welatên din cih girtin. Lê di van hemû şeran de artêşên ereban bi bin ketin. Ji lewra êdî şerê gerîla bêhtir dihat pejrandin. Filistîniyan baş fêm kirin ku divê pirsgirêka xwe bi destên xwe çareser bikin û li benda Kral û serokên ereban nemînin. Wisa jî, çalakiyên gerîlayî û fedayiyane bi awayekî xurt derketin holê.

Çalakiyên mîlîtanên Filistînî yên fedayî di hemû cîhanê de bi nav û bang e û bala hemû cîhanê kişandin ser doza gelê xwe. Di aliyê din de, tevgerên azadîxwaz ên Filistînî ji hemû hêz û gelên bindest re bûn mînaka berxwedanê û wargehên şervanên Filistînî bûn cihê perwerdeya şervanên gelên bindest û azadîxwaz ên cuda cuda.

Çalakiyên mîlîtanên Filistînî bi gelek reng û şêwazan dihatin li darxsitin, çalakiyên wan ên herî balkêş, bibandor ku bala hemû cîhanê kişandin û derbeyên pir mezin li dijminê xwe xistin ew çalakiyên rivandina balefiran bûn. Bi saya van çalakiyên, cîhana rojava neçar ma ku bi mijara gelê Filistînê re mijûl bibe. An go piştî sala 1965'an bi saya çalakiyên rivandina balefiran, doza gelê Filistînê û têkoşîna wan kete rojeva hemû cîhanê.

Di nava çend salan de, fedayiyên Filistînî gelek çalakiyên revandinê yên serkeftî lidarxsitin. Serkeftina van çalakiyan bi saya perwerdeya kûr û xurt a mîlîtanan bû. Mîlîtanên ku ji bo tîmên revandina balefiran dihatin hilbijartin, di perwerdeyeke pir kûr û xurt re derbas dibûn. Fêrî ajotina balefiran, bikaranînan çekan, xweveşartin, sazkirina bombeyan û li ser hemû mijarên pêwîst perwerde dibûn.

Di sala 1968'an de yekemîn çalakî bi revandina balefireke îsraîlî a firmaya (Îl Al) a ji Roma diçû Televîvê. Ev balafir ji aliyê fedayiyên Filistînî ve hat revandin û berê wê dan balefirgeha Cezayîrê. Piştî vê çalakiyê, êdî çalakiyên bi vî rengî destpê kirin û gelek salan dewam bûn. Di nava mîlîtanên ku çalakiyên revandina balefiran li dardixistin de, navek wek stêrkan geş û bilind bû. Di demeke kurt de, ev nav kete rojeva hemû cîhanê û heta roja îro jî, wek sembolekê di nava gelê Filistînî û hemû hêzên şoreşger de tên naskirin. Ew çalakvana filistînî Leyla Xalid bû.

**Çalakiya yekemîn**

Piştî perwerdeya taybet a salekê, ku Leyla pir baş derbas kir û fêrî gelek tiştan bû, biryar hat girtin ku Leyla yekemîn çalakiya xwe pêk bîne. Di sala 1969'an de, Leyla li gel hevalekî xwe yê din balafira firmeya Trans World a di navbera Roma û Etîna de difirî, ji aliyê Leyla Xalid ve hate kontrolkirin. Piştî wê Leyla berê balefirê da ezmanên Filistînê, ji wir jî berê wê da balefirgeha Şamê. Li Şamê Leyla hemû kesên di balefirê de serbest berdan û piştre balafir teqand. Piştî vê çalakiyê nav û dengê Leyla Xalid gihîşte hemû derên cîhanê. Doza gelê Filistînê û têkoşîna wan a azadiyê di rojeva cîhanê de wek agir gur bû. Wisa jî ev çalakî gişte armanca xwe. Ew jî ku bala raya giştî bikşînin ser doza gelê Filistînî.

Di wê demê de hemû serokên Ereban pişta xwe dane gelê Filistînê û dev ji arîkariya wan berdan. Êdî bawerî û hêviya gel û şoreşgerên Filistînî bi serok û dewletên ereban neman; ji lewra xwestin ku kula xwe bi destên xwe derman bikin. Bi vê mebestê, fedayêyên taybet ên revandina balefiran, ji bo revandina çend balefiran û di heman rojê de hatin şandin. Gelek armancên siyasî ji van çalakiyan hebûn.

1- Şermezarkirina serokên ereban ên dev ji alîkariya filistîniyan berdan.
2- Berdana şorşegerên filistînî yên di zindanan de.
3- Tolgirtina ji welatên Rojava yê ku arîkariyê didin Îsraîlê.
4- Gihandina dengê xwe ji bo raya giştî ya cîhanê.

Hêjayî gotinê ye ku gelek şoreşgerên ji gelên cuda jî di nava fedayiyên taybet de hebûn. Şoreşgerên artêşa Sor ên Japonî, şoreşgerên afrîkî û almanî jî hebûn. Li gorî nexşeya rêze çalakiyan, diviyabû ku balafirên van welatan werin revandin: Israîl, Amerîka, Swîsre û Îngilistan.

Di nava fedayiyan de dîsa Leyla Xalid hebû, ew di taxima revandina balafira Îsraîlî de bû. Berî salekê dema ku Leyla balafir revandibû û li Şamê teqandibû, wêneyên wê li hemû cîhanê belav bibûn û êdî her kesî ew pir bi asanî nas dikirin. Ji bona vê astengiyêji holê rabike, Leyla 6 opersyonên estetîkê û guhertina rûyê xwe dane kirin, bi vî awayî wê şiklê rûyê xwe guhertiye û êdî bi asanî nedihat nasîn. Ev hemû jî, ji bo lidarxistina van çalakiyên fedayiyane.

Di roja 7'ê îlona sala 1970, li bajarê Emsterdamê, Leyla Xalid li gel hevalekî xwe yê bi navê Abdulmuhsin Huseyn wekî bûk û zava siwarî balafera Îsraîlî ya ku ji Telavîvê hatibû û wê biçûba NewYorkê bûn. Bi wan re du hevalên din jî hebûn, lê ji ber ku ew efrîqî bûn, destûr ji wan re nehat dayîn ku siwarî balefira Îsraîlî bibin, wisa jî taxima Leyla du hevalên xwe winda kirin. Piştî firîna balafirê Leyla dest bi çalakiya xwe kir, lê haya wê tûnebû ku gelek polîsên Îsraîlî jî di balefirê de ne, di encamê de Abdulmuhsen hat kuştin û Leyla jî hat dîl girtin, balafir jî neçar bû ku li balefirgeheke Îngiltira dakevê erdê.

Gelo çi bi herdu endamên taxima Leyla yên Efrîqî hat? Piştî ku destûr ji wan re nehat dayîn ku li balefira Îsraîlî siwar bibin, wan yekser planeke xwe ya nû çêkirin û balefireke Emrîkî cureya Jampu revandin û berê wê dane balefirgeha Qahîra ya Misrê, li wir jî hemû rêwî serbest bedan û balefir teqandin. Di heman dem de, balefireke firmaya (TWA) ku ji Elmaniya firiya, ev balefir jî ji aliyê fedayiyên Filistînî ve hate rivandin û berê wê tevî 149 rêwiyan dane balefirgeheke kevin a li Urdun ê. Ev çalakî bi serkeftî encam bû. Di heman demê de, keçeke din a Filistînî, balefireke firmayên Swîsra bi navê(DS8) li ezmanên Fransa xist bin kontrola xwe û berê wê tevî 308 kesan da balefirgeha kevin a Urdunê. Ev çalakî jî bi serkeftî encam bû. Fedayiyan navê balefirgehê jî guhertin û kirin (Balefirgeha Şoreşê).

Di nava rêwiyan de çi hemwelatiyên Îngilîz tunebûn, fedayiyan dixwestin ku hin hemwelatiyên Îngilîz bigrin û bi azadiya Leyla Xalid re biguherin; ji bo vê yekê, civîneke awarte li darxsitin û biryara rivandina balefireke Îngilîz girtin. Di wê demê de ferman ji fedayiyekî filistîniyê li dewleta Bahreynê re çû ku divê balefireke Îngilîzî birevîne. Balefireke Îngilîz (DS10) ji firmaya (BOAC) ji bajarê Bombayê Hindistanê firiya û di riya xwe de li bajarê Behreynê daket. Berî ku dîsa riya xwe dewam bikê, 3 fedayiyên filistînî lê siwar bûn, piştî ku balafir bi ezman ket, van fedayiyan balafir xistin bin konrola xwe û berê wê tev bi 52 rêwiyên Îngilîz û gelek rêwiyên netewên din berê balefirê dane Balafirgeha Şoreşê li Urdunê.

Piştî gelek dan û standin û bazirganiyên di navbera fedayiyan û dewletên rojavayî de, ev dewlet neçar man ku gelek girtiyên Filistînî ji zindanên xwe serbest bikin, di nava wan de Leyla jî hebû. Bi vî awayî hemû çalakî bi serketin. Gelek girtiyên filistînî serbest hatin berdan. Li hemberî vê yekê, fedayiyan jî gav avêtin û hemû rêwî serbest berdan. Lê wan her sê balafirên li balafirgeha Şoreşê teqandin.

Piştî îlona sala 1970'î, fermandariya giştî ya Eniya Gelêrî ya Rizgariya Filistînî biryar rawestandina çalakiyên revandina balefiran da. Ji ber ku çalakî gihîştibûn armanca xwe. Êdî doz û têkoşîna Filistînê ketibû rojeva rayagiştî ya cîhanê. Êdî hemû cîhanê fêm kirin ku heya vê pirsgirêkê çareser nekin, wê ew jî bi aramî nejîn. Êdî doza gelê filistînê ji warekî herêmî derketibû û bûbû dozeke cîhanî.

Tiştê herî balkêş jî ew e ku fedayiyên filistînî pir bi şarezayî û pispor î çalakiyên xwe pêk anîne, pir bi muqateyî nêzik bûne ta ku çi zirer û ziyan negihînin mirovên bêguneh ên sivîl. Jixwe di nava van hemû çalakiyan de, çi ziyan negihîştiye rêwiyan. Tenê fedayiyê bi navê Abdulmuhsen Huseyn hate kuştin.

Di salên dûr û dirêj ên têkoşîna gelê filistînê de, gelek cure û şêwazên şer û çalakiyan pêk anîne. Ev hemû jî dikevin nava şêwazê şerên gerîla yên modern. Helbet şoreşgerên gilistînî, ji ezmûn û dîroka têkoşînên netewên din gelek feyde girtine û li gorî rastî û resentiya xwe serarast kirine. Li rexekî din jî, wan gelek ezmûn û zanabûnên xwe yên tektîkên têkoşîna çekdarî dane azadîxwazên gelên din. Jixwe jî bilî fedayiyên filistînî, gelek şorşegerên netewên din jî, di nava têkoşîna gelê filistînî de cih girtine û li hemberî siyonîzma faşîst şer kirine. Çeqel Karlos, Endamên Artêşa Sor a Japonê, ÎRA, çepên tirk û şoreşgerên kurd di wan deman de li rex şervanên Filistînî mane û têkoşînek hevpar kirine. Şehadeta 11 rêhevalên me yên (PKK) di şerê li hemberî Îsraîl de mînaka herî ronak a vê rastiyê ye.

Em dîsa vegerin ser Leyla Xalid. Leyla Xalid bi saya van çalakiyan bû yek ji kesên herî navdar ên cîhanê, bû nîşanek ji nîşanên têkoşîna gelê filistînê û netewên bindest, ew bû destana gelê xwe. Ji bo kuştina vê destanê, sîxur û artêşa Îsraîlê gelek hewldanên Suîqastê kirin, lê hemû jî vala derketin. Leyla Xalid li pey popolîzmê neriviya û rastiya xwe ji bîr nekir. Wê her tim di nava gelê xwe de, di nava jina filistînî de wek mîlîtanekê têkoşîn kiriye. Niha jî, xebata xwe ya siyasî û têkoşîna bo azadiya welatê xwe dike.

Ev 37'sal di ser çalakiyên wê re derbas bûn, bi dehan pirtûk, belge fîlm, gotar û nivîsar li ser Leyla Xalid derketine. Niha li Urdunê jiyana xwe ya normal didomîne. Wê ji her kesî re nîşan da ku dema jin bixwazibe, dikare her tiştî bike û serkeftinên herî mezin bi dest bixe.



## Leyla Xalid kî ye?

ŞOREŞGERA filistînî ya bi nav û bang di sala 1944'an de li bajarê El Heyfa li filistînê ji dayik bûye. Piştî sê salan jidayikbûna Leyla, dewleta Israîlê tê îlankirin û hemû gelê filistînî bi zor û terorê re rû bi rû dimînin, wek bi sed hezaran malbatên filistîniyan, malbata Leylaya çar salî jî cîwarê xwe berdide û li başûrê Lubnanê, li bajarê Sur dibin penaber. Leyla xwendina xwe ya zankoyê li Beyrûdê temam dike û diçe dewleta Kuweytê, li wir dibe dersdar (mamoste). Li wir têkiliya xwe bi hemû filistîniyên koçber re çêdikê û alîkariya Eniya Gelêrî ya Rizgariya Filistînê dike. Ev rêxistin di sala 1967'an de ji aliyê Dr. Corc Hebeş ve hatiye damezrandin. Leyla jî tevlî vê rêxstina şoreşger dibê û di bin fermandariya Dr. Waddî Heddad de perwerdeya taybet a revandina balafiran dibîne.

ROJEV
5 Kanûn 2009 Hejmar: 23 Sal: 1 E-mail: awelat2002@yahoo.com





# Cejna Gadîr Hum hate pîrozkirin

**Cejna Gadîr Hum ji aliyê elewiyên Antakyayê ve her sal 8 roj piştî Cejna Qurbanê tê pîrozkirin. Di vê rojê de elewî berê xwe didin turbeyan. Her wiha hemû esnaf jî kargehên xwe ji bo cejnê rojekê digirin**

Elewiyên ku li Antakyayê dijîn, bi munasebeta Cejna Gadîr Hum ber bi turbeyan ve herikîn. Elewiyan li ser turbeyan qurban dan û kargehên xwe ji bo rojekê girtin.

Elewiyên ku li Antakyayê dijîn Cejna Gadir Hum pîroz dikin. Cejna Gadir Hum dema Hz Mihemed oi sefera hecê ya xatirxwestinê de li Garir Humê xudbê dixwîne û di vê xutbê de Hz. Elî wek welî diyar dike. Ji ber vê jî Elewiyan ew roj wek cejna Gadir Hum destnîşan kirine û pîroz dikin.

Elewiyan di saetên êvarê de berê xwe dan turbeyan û li wir qurban serjê kirin. Di saetên serê sibê de jî bi hezaran kesî berê xwe dan qontarên Çiyayên Habîbî Neccar turbeya 'Sultan'. Her wiha esnafên elewî jî kargehên xwe ji bo rojê girtin. Ligel vê esnafên xirîstiyan, yahudî û ermenî jî dukanên xwe venekirin û coş û heyecana cejna elewiyan parve kirin. Bi wesîleya roja Cejna Gadîr Gum serokê Weqfa Ehlî Beyt Alî Yerel daxuyaniyek da û destnîşan kir ku ev roj ji bo wan gelek watedar e. Yerel wiha dirêjî da axaftina xwe: "29 Zîlhîche, roja Hz. Muhammed mecbûr dimîne ku koçî Medîneyê bike, ji bo ku bala neyaran nekişîne Hz Elî dikeve nav nivînên Hz Muhammed. Ji ber vê ev roj ji bo gelek bi wateye. Em her sal cejna xwe bi coş û heyecaneke mezin pîroz dikin. Coş û heyecana me ya îsal jî didome. Bila Gadîr Hum li hemû elewiyan pîroz be."

**Gadîr Hum çi ye?**

Li gorî Elewiyan Hz Mihemed dema ji heca dawî ya xatirxwestinê vegeriya (18 zîlhîcce) xutbeya xatirxwestinê xwend û Hz Elî wek waris (wekîl) diyar kir. Elewî destnîşan dikin ev wehî bûye û Hz Mihemed wehiya hatî di xutbeya navborî de aniye ziman.

Ev Cejn, 8 roj piştî Cejna Qurbanê tê pîrozkirin. **HATAY**

# Ji meteorolojiyê hişyarî

NAVENDA NÛÇELAN - AMED

Midûriyeta Giştî ya Karê Meteorolojiyê ya Dewletê ragihand ku dê li Tirkiyeyê li gelek herêman baran bibare. Meteorolojiyê gel hişyar kir û da zanîn ku bila welatî li dijî rewşên awarte bi tedbîr bin.

Midûriyeta Giştî ya Karên Meteorolojiyê der barê rewşa hewayê de daxuyaniyek da û destnîşan kir ku dê şilî li herêma Antalyayê gelek bi bandor be. Di berdewamiya daxuyaniya meteorojiyê de wiha tê gotin:

"Li herêmên başûr jî baran dê dem bi dem hebe. Li herêmên navîn dê baran bibare. Baran di saetên serê sibê de li Anatoliya Rojhilat li cihên bilind bibare û li herêma Deryayareş dê berf û baran şilope bibare. Li herêma navîn û herêm rojhilat germahî 4-6 derece dikeve. Di cihên din guherînên berbiçav dê pêk neyê. Li herêma Antalyayê baran dê zêde bibare û ji ber vê jî dibe ku rewşên awarte derkevin holê. Ji bo vê divê gel li hemberî lehiyê baldar bin û tedbîrên xwe bigirin."



# Di reçeteyan de şaşî hene

Derket holê ku di her 10 reçeteyî yekê de şaşî heye û ev şaşî jî zirarê didin nexweşan. Li nûçeya Daily Telepgraph, Konseya Tip a Giştî lêkolîneke daye destpêkirin û di encama vê lêkolînê de derketiye holê ku gelek şaşî di reçeteyan de derketine holê. Ev şaşî wiha ne; dermanê şaş nivîsandin, paşguhkirina alerjiya nexweşan, nivîsên ku di reçeteyê de baş nayên xwendin." Di lêkolînê de li Îngilîstanê 124 hezar û 260 reçeteyên 19 nexweşxaneyan ji alî eczaneyan ve hate kontrolkirin. Di encama kontrolê de 11 hezar û 77 şaşî hatin tespîtkirin. Hate hînbûn hêj gelek şaşî jî ji alî eczaneyan ve nehatine tespîtkirin. Der barê şaşiyan de bi hin doktoran re hevdîtin pêk hatin. Di van hevdîtinan de hin doktoran şaşiyên xwe qebûl kirin. Doktoran diyar kirin ku eger ku şaşiyên wisa hebin, bila eczane li van şaşiyan baldar bin.

Hate destnîşankirin ku ev şaşiyên k udi reçeteyan de derdikevin ji sedî 2 rê li mirinê vedike. Ji her 20 şaşiyî yek cîdiye. Çimkî carna doza ku tê dayîn mirova jehrî dikin. Lewre derket holê ku doktor dermanê pêwist nade nexweşê xwe û nexweşê xwe wisa dişîne mal. **LONDON**

# Li başûr 15 hezar zarokên karker hene

Li gor îstatîstîkên Rêxirawê Minalparêzên Kurdistanê, li Herêma Kurdistanê 14 hezar û 878 zarokên karker hene.

Sekreterê Rêxirawê Minalparêzên Kurdistanê Şasiwar Sedîq, ragihand ku rêxirawê wan li gorî çend mercan foneke 75-150 hezar dînarî dide 121 zarokan û berê ji aliyê malbatên wan ve kar bi wan hatiye kirin û bi vî awayî niha ji karkirina nav bazarê dûr ketine. Li gor îstatîstîkên Rêxirawê Minalparêzên Kurdistanê, li Herêma Kurdistanê 14 hezar û 878 zarokên karker hene. Piraniya li Hewlêrê ne û hejmara wan jî 8 hezar 246 e. Li Silêmaniyê 4 hezar û 67 û li Dihokê jî 2 hezar 565 zarok kar dikin. Li gor heman îstatîstîkan, ji 14 hezar û 878 zarokên karker, karê 4 hezar û 153 zarokan metirsîdar e, 4 hezar û 745 zarok ji ber hejarî kar dikin û 3 hezar û 264 zarok jî naxwînin.


*RÛDAW*

# 24 kesên baqiltirîn yên 10 salên dawî kî ne?

*Malpera amerîkî "The Daily Beast" di 10 salên dawî de baqiltirîn kesên cîhanê hilbijartine. Li gor vê ev kes ev in:*

1 - Damezrênerên Googleyê Larry Page û Sergey Brin
2 - Damezrêner û şirîkê Appleyê Steve Jobs
3 - Wezîrê Enerjiyê yê DYA'yê Steven Chu ku xelata Nobelê jî standiye
4 - Wezîra Derve ya DYA'yê Hillary Clinton
5 - Xwediyê xelata Nobelê ya aştiyê ya sala 2006'ê Muhammed Yunus
6 - Xwediyê xelata nobelê ya sala 1989'ê ya TIP'ê Harold Varmus
7 - Xwediya xelata nobelê ya sala 2009'ê profosora Universiteya California ya beşê Biyolojî û Fizyolojiyê Elizabeth Blackburn
8 - Rêvebrerê kampanyaya hilbijartinên Obama û xwediyê "AKPD Message and Media" David Plouffe
9 - CEO û damezrênera Acumen Fonê Jacqueline Novogratz
10 - Elizabeth Warren profosorê Hiqûqê ya Universiteya Harwardê
11 - Damezrênerê ansiklopediya Internetê ya Wikipediayê Jimmy Wales
12 - Damezrênerê malpera kirîn û firotinê Amazon.comê Jeff Bezos
13 - Profesorê felsefeyê Unuversîteya Princetonê Kwame Anthony Appiah
14 - Damezrînerê malpera nûçeyan ya amerîkî Huffington Post ku herî pirr tê xwendin Arianna Huffington
15 - Nivîskarê kovara New Yorkerê Malcolm Gladwell
16 - Ekonomîstê amarîkî Nouriel Roubini
17 - Fermandarê amerîkî David Petraeus
18 - Hiqûqzan Lawrence Lessig
19 - Şanoger Will Wright
20 - Şîrovegerê Fox Newsê, û nivîskarê rojnameya The Wall Street Karl Rove
21 - Şaredarê New Yorkê Michael Bloomberg
22 - Yek ji rêberê Al Qaîdeyê Ayman Al-Zewahirî
23 - Nivîskar, Derhêner, û çêker David Chase
24 - CEoyê Fox Newsê Roger Ailes

**NETKURD**





# Xwendekarên DU'yê tevli kampanyaya paqijiyê bûn

Xwendekarên Zanîngeha Dîcleyê (DU) û nûnerên Serokatiya Daîreya Kontrol û Parastina Hawirdorê ya Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê, di çarçoveya kampanayaya paqijiyê de çop berhev kirin.

Xwendekarên Zanîngeha Dîcleyê (DU) û nûnerên Serokatiya Daîreya Kontrol û Parastina Hawirdorê ya Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê, di çarçoveya kampanayaya paqijiyê çop berhev kirin. Li qada Deriyêçiyê hemû xwendenkar hatin cem hev û tişortê rengê narencî li xwe kirin.

Xwendekaran dest bi berhevkirina çopê kirin. Cîgirê Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê Alî Şîmşek jî hate cem xwendekaran û piştgirî da xebata wan. Şîmşek ji bo nêzîkatiya xwendekaran a ji bo paqijiyê spasiyên xwe pêşkêş kirin.

Şîmşek li vir axaftinek kurt kir û piştî axaftinê li Cadeya Gazî çop berhev kirin. **AMED**

www.arsivakurdi.org